Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1107 | 11-Cotmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | 423165

# Helbesta Nagîhanê ya bi Kurdî

**Rojnamevan Nagîhan Akarsel, bi xebatên xwe yên di warê jineolojiyê jî dihat naskirin û wê hin caran xem û keserên xwe derdibirîn û bi helbestan ew dinivîsandin; wê ev jî bi zimanê dayika xwe Kurdî dikir. Ew bi helbesta xwe ya "Ger" teswîreke berxwedanê ya li Kurdistanê derdixe holê.**



Endama Akademiya Jineolojiyê û Desteya Weşanê ya Kovara Jineolojiyê Nagîhan Akarsel di 4'ê Cotmeha 2022'an de li bajarê Silêmaniyê yê Herêma Kurdistanê, bi êrişeke hêzên ser bi dewleta Tirk a dagirker şehîd bûbû. Nagîhan Akarsel a ku bû şopdara bîrdozî û rizgariya jinan a 'Jin jiyan azadî' û li pey xwe ji bo jinan têkoşîneke bêhempa hişt, bi nivîs û helbetsên xwe jî riya têkoşînê ya jinan ronî kir. Nagîhan Akarsel sala 1976'an li bajarokê Xelîkan ê navçeya Cîhanbeylî ya Konyayê ji dayik bû. Dibistanên seretayî, navîn û lîse li vê derê temam kirin. Di îmtîhanên zanîngehê de heq kir ku li Zanîngeha Gazî ya Enqereyê beşa Rojnamevanî, Çapemenî û Weşanê bixwîne. Bi salan ji bo çapemeniya Kurd xebitî û kar kir. Nagîhan Akarsel her wiha helbestên Kurdî jî dinivîsand. Va ye helbesteke wê ya Kurdî ya bi navê "Ger" ku li ser rûpelên deftera xwe nivîsandibû. Em helbesta wê bi we re parve dikin.

**Ger**

Ger li rûyê erdê li cihekî
Rengê asîman xumam bûbe
Bizane ku li wê derê hinek kes bi rondikên çavan
Bi êşan
Bi sebrê li ber xwe didin.
Ya ku tenê dihêle
Agirê evînê yê li dû çûyiyan havên negirtiye
Jana ku ketiye nava dilê bi milyonan
Di dilê nazik û nazenîn de kemîna li pêş hemû xweşikiyan
Bi bêhna sêvê li ber deriyê xewnên bê dawî cemidî
Welatekî ku rûyê xwe
Di birîna ku xwîn jê tê û bedena ku bê bêhn maye dide li wê derê ye
Û ya ku ji Deriyê Sîm hêdî hêdî diherike dilan
Li Êzidxanê şahidiya hevdîtina Leyla û Mecûn dike
Bêriya ku xwe bi hêrsa Edûlê xemilandiye ye
An jî zanebûna ku bi baweriya Besê dizane
Her kevirekî Dêrsimê helbestek e
Li Şengalê di nava ziyaretên ku girêdayî kevira teberek a bi pîrozbûnê tê parastin
Di nava ziyaretan de di mekanê marê reş de cihê ku secde lê tê kirin
Belê ne tenê li cihê razên cîhanê li cihê ku razên gerdûnê diparêze
Du stêrk xuricîn ji cîhanê
Ji Çilmêran heta Çilxanê ji wê derê heta Dêrsimê
Dibe ku ber bi Çilkaniyê ve ketibin rêwîtiyê
Sekneke wan a mexrûr tunebû
Dilnizmiya Deriyê Sîm û Şengalê di sekna wan de xuya bû
Di rûyê wan de kenîneke şermok
Dema ku bi destên gerîlayên serdemê digirtin
Bi heyecana zarokeke bextewar
Cîhan bêdeng dima ji sekna wan re
Qet ne hewce ye mirov biçe dûr
Ger di rûpelî de bisekinin
Li çavên wan binêrin
Dê bibînin ku hemû xweşikbûnên cîhanê di çavên wan de dibiriqin
Dê dengê hechecikên ku li ser porê wan ê spî dixwînin bibihîsin
Dê dûrbûna di navbera dil û mêjiyê wan de biqede
Ger li çavên van her du mêrên bedew ên cîhanê binêrin
Dê bibînin ka çawa mêrîtî kuştine.
NÛJÎNHA

# Bi karê destê xwe mala xwe xemilandiye

**Feysel Ferho bi karê destê xwe mala xwe bi textan xemilandiye.**



Feysel Ferho temenê wî (47) saliye ji taxa Salihiyê ya bajarê Hesekê ye. Feysel û hevjîna xwe di xaniyekî kevnar de dijîn ku ji odeyekê û hewşekê ku darek tê de heye pêk tê.

Feysel Ferho xwest tiştên cuda di xaniyê xwe de bike, ji bo vê jî wî textik bi kar anîn ku rewş û xemleke xweşik daye xaniyê xwe. Xemla mala Feysel bala kesên ku serdana wî dikin, dikişîne.

Feysel Ferho destnîşan kir ku wî teşe û dîzaynên malên textî ji internêtê û xaniyên hin hevalên xwe girtin û xwest li gor dilê xwe xaniyê xwe bixemilîne.

Ev 10 sal in Feysel Ferho vê pîşeyê dike. Berhemên ku wî ji textikan çêkirine ne tenê ji bo xemilandinê bûn, herwiha tiştên sereke yên malê wek sîwana hewşê, kursî û maseyên textî û kursiyên biçûk ên girover çêkirine.

Feysel Ferho got: "Ez li xanî rûdiniştim û meyze dikir ka ez ê çi biguherînim û çi sererast bikim. Piştre min di xeyalê xwe de ew tişt amade dikir, min çêdikir."

Feysel odyeke textî jî çêkir û hemû tiştên di xaniyê wî de wekî çarçoveyên li derdora televîzyonê, derî, pencere, sendoq, mase, kanabe, maseya xwarinê û dîwarê xaniyê ji textikan hatine çêkirin

**Di textî de vehesiyê dibîne**

Feysel Ferho di xaniyên textî de ne tenê ji bo xemilandinê dimîne, di heman demê de wekî cihê vehsiyê û devereke aram ji bo kar dibîne.

Sudoku: Bersiv 18

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 6 | 7 | 4 | 2 | 8 | 1 | 5 | 3 |
| 8 | 3 | 4 | 5 | 1 | 6 | 9 | 7 | 2 |
| 2 | 1 | 5 | 3 | 7 | 9 | 4 | 6 | 8 |
| 7 | 8 | 9 | 1 | 5 | 3 | 2 | 4 | 6 |
| 6 | 2 | 3 | 7 | 9 | 4 | 8 | 1 | 5 |
| 5 | 4 | 1 | 8 | 6 | 2 | 3 | 9 | 7 |
| 4 | 7 | 2 | 9 | 8 | 5 | 6 | 3 | 1 |
| 3 | 5 | 6 | 2 | 4 | 1 | 7 | 8 | 9 |
| 1 | 9 | 8 | 6 | 3 | 7 | 5 | 2 | 4 |

Sudoku:Pirs 19

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 8 | 9 | | | 2 | | |
| 7 | | 9 | | 5 | | | 1 | |
| | | 1 | | | | | 6 | 9 |
| | 2 | | | | 4 | | 8 | |
| 1 | 7 | | | 9 | | | 3 | 5 |
| | 9 | | 1 | | | | 2 | |
| 9 | 8 | | | | | 1 | | |
| | 3 | | | 1 | | 4 | | 2 |
| | | 5 | | | 3 | 8 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Diyên qîzan nemirine:**
- Qîz pir in tu çima xeman dixwî?

**Êşa me yek e:**
- Em jî bi qasî we pê diêşin.

**Gula wê qermiçî:**
- Rewşa wê xirab bû; keyfa wê nema.

**Gula wê qurmiçî:**
- Bi heman wateyê.

**Ji destê min felitî:**
- Min xwe zû negihandê; ez dereng mam.
-Dema dilê yekî li ser tiştekî dimîne wisa dibêje. Heyfa xwe lê tîne.

**Kela girî ket qirika wî:**
- Ji xemgînî girê ketin qirika wî û çavên wî tijî bûn.

**Kelûgirî bû:**
- Bi heman wateyê.

**Kewên te êdî naxwînin:**
- Tu xemgîn î.

**Mala minê:**
- Ez pir li ber ketim; pir heyf bû; heyf û mixabin.

**Qirçîn ji nava min hat/tipîn ji nava min hat:**
- Ez pir pê êşiyam; ez pir xemgîn bûm.

**Reş girê daye:**
- Ketiyê şînê; di şînê de ye.

**Ser hev de çû/bi ser hev de çû:**
- Pir li ber ket; pir pê êşiya.

**Ser xwe ve hat/bi ser xwe ve hat:**
- Xemgîniya wî sivik bû.

**Simbêlên wî ketibûn devê wî:**
- Pir xemgîn bûbû.

**Tu dibêjî qey demana darê jê tê xwestin:**
- Pir xemgîn bûye; perîşan bûye.

**Tu dibêjî qey xeraca Mûsilê jê tê xwestin:**
- Bi heman wateyê.

**Werekên min diwerin:**
- Hêz bi min re namîne; keyf bi min re namîne; ez pir diqehirim.

**Xew nakeve çavê wî:**
- Pir xemgîn e.

**LI SER HÊRSÊ**

**Agir ber bû min:**
- Ez pir hêrs bûm.

**Agir ji devê wî dibeyî:**
- Pir hêrs bûye; pir xeyidiye.

**Agir ji devê wî dibare:**
- Bi heman wateyê.

**Agir ji çavê wî diçe:**
- Bi heman wateyê.

**Agir pê ket:**
- Pir hêrs bû.

**Agir pê ketiye:**
- Pir hêrs bûye; pir qehiriye; mirov newêre xwe nêzîk bike.

**Aqil di serê min de nema:**
- Ez pir hêrs bûm.

**Biagir e:**
- Pir zû hêrs dibe.

**Bi serê pozê xwe diaxive/bi serê pozê xwe pê re diaxive:**
- Jê hêrs bûye; jê xeyidiye.

**Bi cinan ketiye:**
- Pir hêrs bûye.

**Bi çolan ket:**
- Dîn bû; pir hêrs bû.

**Bi avê serxweş dibe:**
- Zû hêrs dibe; pir bêhnteng e; dendikeke sîrê di qûna wî de bi cih nabe.

**Bû xwê ket agir:**
- Dîn bû; har bû; pir hêrs bû.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



## 'Şehîd Hevrîn mîna pira gihandina azadiya jin û civakan e'

Di pêvajoya şoreşa Rojava de şehîd Hevrîn Xelef bê westandin têkoşîneke bê sînor da meşandin û di demên herî zehmet de bû mînaka jina kedkar û azadîxwaz. Sîham Daûd diyar kir ku şehîd Hevrîn mîna pira gihandina azadiya jin û civakan bû.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1107 | 11-Cotmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

## Kongra Star: Komplogeran felsefeya Rêber Apo armanc girtin



Berdevka Kongira Star a Kantona Qamişlo Şaha Xelîl da zanîn ku komplogeran felsefeya Rêbertî armanc girtin. Herwiha got, ji bo komplo û tecrîd bi dawî bibe û heta asta têkoşîna ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo were bilindkirin; divê hemû jin felsefeya Rêber Apo nas bikin.**R-5**

# TÊKOŞÎNA GELÊ KURD WÊ AZADIYA RÊBER APO MISOGER BIKE






Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik di salvegera 25'an a Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmehê de destnîşan kir ku Sîstema tecrîd û îşkenceya Îmraliyê di çarçoveya komploya navneteweyî de hat pêşxistin. Dema ku girêdana di navbera gelê Kurd û Rêber Apo de bi komployeke navneteweyî nehat şikandin, dijmin û hêzên komploger ji bo vê pêk bînin sîstema Îmraliyê pêş xistin. Cemîl Bayik destnîşan kir ku wê bi têkoşîna gelê Kurd azadiya Rêber Abdullah Ocalan misoger bibe û komplo biqede.**R-3**

## 'Armanca êrîşan qirkirina gelên azadîxwaz e'



Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk Tev-Dem Xerîb Hiso diyar kir ku armanca êrîşên dewleta Tirk ya dagirker qirkirina gelê kurd û têkbirina pergala Rêveberiya Xweser e. Herwiha da zanîn ku civaka nevdewletî ji bo berjewendiyê xwe li hemberî êrîşan bê denge.**R-4**

## 'Hêza Parastina Civakî misogeriya hebûna civakê ye'

Pişt destpêkirina Şoreşa 19'ê, ji bo parastin û rêxistinkirina civakê, Hêza Parastina Civakî HPC'ê li Rojavayê Kurdistanê hat avakirin û ji bo xizmeta civakê gelek kar û xebat da meşandin. Yek ji Rêveberê Hêza parastina civakî ya bajarê Qamişlo Nebîl Ismayîl HPC'ê parastina nirx û nasnameya civakê dike.**R-6**

## Pirrengiya zimanê Kurdî



Ziman pergalek ji sembol û nîşana ne ku amûra zimanî pêk tîne, ziman di hemî qadên cîhanê de wekî amûra herî girîng a têgihiştin û peywendiya di navbere endamên civakê de tê hesibandin. Di destpêka jiyanê de ziman nebû, mirov bi riya çavlêkirina lawiran bi qîran pêwendî dikirin, piştre îşaret, sembol û di dawiyê de jî bi xêzkirina tîpan mirov peywendî li gel hev didane çêkirin. Zimanê herî kevin di dîrokê de zimanê Somerî ye ku vedigere 3500 sal beriya zayinê.**R-7**

Zekî Bedran
Gelên Sûriyê neçarin li hemberî êrişên wêrankar li ber xwe bidin *R-5*

Farûk Sakik
Li dijî komployê berxwedana Rêber Apo *R-5*



Nehîr pale
Li paytexta Tirkiyê çalakîkirin helwestekî bi rûmet bû *R-2*

Dilyar Cizîrî
Êrişên wan hêza xweseriyê nîşan dide *R-4*



# ‘Arîn Mîrkan Sembola tevahiya jinên azadîxwaz e’

Şervana fedayî Arîn Mîrkan bi felsefeya jin, jiyan, azadî çalakiya fedayî di berxwedana Kobanê de pêk anî. Feraşîn Qamişlo diyar kir ku Arîn Mîrkan bi hêz, vîn, cesaret û sekina xwe destkeftiyên şoreşa jinan serxist û bû sembola tevahî jinên azadîxwaz.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Arîn Mîrkan bi navê rast Dilara Kînc li gundê Mîrkan ango Hisê yê girêdayî navçeya Mabeta ya Efrînê di sala 1992`an de ji dayîk bû. Dibistana xwe ya seretayî û navîn li gundê Mîrkan xwendiye. Ji ber ku di nava malbateke welatparêz de mezin dibe, di têgihîştina rastiya Kurd û Kurdistanê de tu astengiyan nabîne. Arîn Mîrkan di sala 2007`an de bi biryardariyeke xurt berê xwe dide têkoşîna azadiyê. Bi şoreşa Rojava re di 2012`an de û avabûna YPJ`ê di Nîsana 2013`an de, Arîn Mîrkan vedigere Rojavayê Kurdistanê û cihê xwe di nava YPJ`ê de digre. Têkoşer Arîn xwedî sekin û kesayeteke bi coş û moral bû. Herwiha di nava YPJ`ê de bi rengekî xwezayî rola fermandariyê dilîst û ji bona hevalên xwe çavkaniya hêvî û coşê bû. Di 15`ê Îlona 2014`an de, çeteyên DAIŞ`ê ji 3`ê aliyan ve bi êrîşeke dijwar berê xwe dane Kobanê. Ji bo parastina Kobanê şervanên YPJ`ê, YPG`ê û gelê welatparêz li dijî êrîşan li ber xwe dan. Di 5`ê Îlonê de êrîşên çeteyan gihiştin Girê Miştenûr, ji ber Miştenûr cihekî stratejîk bû, çete bi hemû hêza xwe êrîş kirin. Di wê navberê de têkoşer Arîn Mîrkan bi cesaret û vîneke xurt, ji bo parastina hevalên xwe û Kobanê çalakiya fedayî pêk anî. Bi vê çalakiyê re asta berxwedan û têkoşîna şervanên YPJ`ê digihîje lûtkeyê. Ev berxwedan û têkoşîn bi rizgarkirina Kobanê di 26`ê Çileya 2015`an de tacîdar dibe û YPJ`ê weke nasnameya tevahî jinên azadîxwaz hat pênasekirin.

5’ê Cotmehê salvegera 9`emîn a operasyona Tevgera Azadiyê ya şervanên Yekîneyên Parastina Jin, Arîn Mîrkan e, ku di berxwedana Kobanê de li hember



êrîşên çeteyên DAIŞ’ê pêk anî. Derbarê salvegera Şehadeta Arîn Mîrkan Şervana YPJ`ê Feraşîn Qamişlo ji rojnemeya me re axivî.

**‘Arîn Mîrkan pêşengê şoreşa jinan e’**

Bi artêşbûn û rêxistinbûna jinên Kurd re rewşa jinên Kurd jî ber bi guhertinê ve çû. Jinên Kurd xwe li ser bingeha felsefeya Jin, jiyan, azadî birêxistin kirin û bîrdoziya rizgariya jinan ji bona xwe kirin armanc. Perspektîfên Rêber Abdullah Ocalan a xwe dispêre felsefeya “jin, jiyan, azadî” ji bo jinên Kurd vejîneke nû bû ku bi saya vê yekê dikaribûn di tevahî qadên jiyanê de bibin xwedî hebûn û misyon. Herwiha rêxistinên xwe yên xweser weke partî, artêş, yekîne, tevger, yekîtî, zanist û hwd. ava kirin. Di nava van destkeftiyan de jinên Kurd bi çalakiyên xwe yên fedayî jî hatin naskirin. Ev jinên ji çar perçeyên Kurdistanê weke Bermal, Şaristan Cizîr, Rewşen, Zîlan, Rêvan Kobanê, Arîn Mîrkan, Avêsta Xabûr û Rûken Zelal bi felsefeya jin, jiyan, azadî bawer kirin û ji bo şoreşa jinan canê xwe feda kirin.

**‘Di şoreşê de xwedî roleke mezin bû’**

Di dirêjahiya dîrokê de, bi hezaran jinên têkoşer û berxwedêr hene ku mohre xwe li dîrokê dane û di warê hişmendî, civakî û rêxistinî de şoreş ava kirine. Herwiha dikaribûn bibin xwedî mîrate û rolên girîng bigrin ser milê xwe. Gelê Kurd ku bi berxwedanî û qehremaniya xwe tê naskirin, jinan di gelek serdeman de pêşengî ji civaka xwe re kirine û bûne bingeha serkeftinê. Ji wan jinan Hepsexana Neqîb, Deyfe Xatûn, Fata Reş, Xanzad Mîrê Soran, Meyan Xatûn, Zerîfe Xanim, Besê Xanim, Qedemxêr, Leyla Qasim, Arîn Mîrkan û bi sedan jinên ku di dem û cihên cuda de bûne pêşengê serhildan û şoreşê hene.

**‘Arîn Mîrkan bû Sembola hemû jinan’**

Feraşîn Qamişlo balkişand ser jinên kurd yên têkoşer ku ji bona azadiya gelê xwe canê xwe feda kirin û got:”Fedayitî ne mijarekî hesane ku mirov bîne ser ziman û pênase bike. Herwiha di nava Tevgera Azadiyê de bi hezaran hevalan ku ji bo azadiya welatê xwe, canê xwe feda kirin, em niha jî li ser şopa wan hevalên fedayî dimeşin û tekoşîn dikin. Fedeayitî ne tenê xwe teqandina di nava dijmin de ye, fedayitî ew e ku di jiyana xwe de mirov bi rengekî feda yî tev bigere û di serî de bi hevaltî û sekna xwe, bi naskirina fikir û felsefeya Rêpber Apo mirov xwe û civaka xwe tenzîm bike û tayibetmendiyên ku me behsa wan kirî



hemû jî di kesayeta Arîn Mîrkan de hebûn. Niha jî jinên kurd bi rihê xwe yê fedayê wekî Arîn Mîrkan, Avesta Xabûr û Barîn, bandora xwe gihandin hemî cîhanê û ji bo hemû jinan bû sembola berxwedanê.”

**‘Fedayîtî ew e ku mirov li hemberî hişmendiya kevneperest şer bike û azad bibe’**

Şervana YPJ`ê Feraşîn Qamişlo di dawiya axaftina xwwe de diyar kir ku ew ê li ser şopa Arîn Mîrkan be û xwedî li xeyalê wê derkeve û got: “Berxwedaniya Arîn Mîrkan heye roja me ya îro bi hezaran jin li ser şopa wê dimeşin. Ji ber vê jî tişta ku ji me tê xwestin, ji bo pêkanîna xewin û xeyalên Arîn Mîrkan, ew e ku em bi sekin, tekoşîn û berxwedana xwe û bi rengekî fedayî, li ser fikir û felsefeya Rêber Apo xwedî li hevalên xwe yên şehîd derkevin. Ji ber ku gava yekê ji bona fedayitiyê ew e ku mirov li hemberî hişmendiya gevneperest şer bike û azad bibe.”

# ‘Şehîd Hevrîn mîna pira gihandina azadiya jin û civakan e’

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

**Di pêvajoya şoreşa Rojava de şehîd Hevrîn Xelef bê westandin têkoşîneke bê sînor da meşandin û di demên herî zehmet de bû mînaka jina kedkar û azadîxwaz. Sîham Daûd diyar kir ku şehîd Hevrîn mîna pira gihandina azadiya jin û civakan bû**



Hevrîn Xelef di sala 1984’an de li gundê Rêhanîkê yê girêdayî bajarê Dêrikê hatiye dinê. Di malbateke welatparêz de mezin bûye û zaroka herî biçûk bû di malê de , ku ji 4 bira û xuşkeke bi navê Zozan ku di nava Tevgera Azadiyê de şehîd bûbû, dayîka Hevrîn bi Rêber Abdullah Ocalan re civiyabû û vê yekê hişt ku Hevrîn xwedî kesayeteke cihêreng be. Hevrîn xwendina xwe ya seretayî, navîn û amadehîyî li dibistanên Dêrikê derbas kir, bi jîr û tabatiya xwe dihat naskirin. Ji zaroktiyê de xwe berpirsyarê her tiştî didît. Endezyariya Medenî di zanîngeha Helebê de bi dawî kir, paşê bi destpêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê re tevli pêşengiya xebatên şoreşê bû.

Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re, Hevrîn Xelef di gelek cihan de xebitî, weke Desteya Enerjî, Desteya Aborî, Rêveberiya Xweser û herî dawî jî, weke jineke siyasetmedar di 27’ê Adara 2018’an de Partiya Sûriyeya Pêşerojê ava kir. Hevrîn jineke xwedî zanist bû, di tevahiya xebatan de kar dikir û cih dadigirt. Di hevaltiya xwe de jî dirust bû, ji bo wê xwedî bandor bû û her kes nirxê wê dizanîbû.

**Armanca Hevrîn avakirina jiyaneke demokratîk bû**

Bi avakirina Partiya Sûriyeya Pêşerojê re, Hevrîn weke Sekretera giştî ya Partiyê hat erkedarkirin. Piraniya xebatên wê di nava civaka Ereb de bûn, ji ber her armancên wê ew bû ku jiyana demokratîk li ser axa Sûriyeyê bê avakirin û aştiyeke mayinde bi xwe re bîne. Herwiha ku îradeya xwe derdora van armancan kir xelek û tu cadahî nedikir navbera ol, mezheb, mirov û civakan. Karê wê karekî mirovahî bû, pê re jî jinên Ereb li derdora xwe kom kir û wan birêxistin dikir. Hevrîn mîna pira gihandina azadiya jin û civakan bû.

**Hevrîn bi kar û xebatên xew aktîv bû**

Şehîd Hevrîn heta demekê kar û xebata aboriya herêmê da meşandin û dema ku Rêveberiya Xweser a Demokratîk di 21`ê Kanûna Duyem 2014`an hate ragihandin, saziyên Rêveberiya Xweser a Demokratîk ên li Cizîrê hatin avakirin, Hevrîn bû cîgira Desteya Enerjiyê ya kantona Cizîrê, her wiha di sala 2015`an dema çend desteyên Rêveberiya Xweser bûn yek, Hevrîn di encama hilbijartinan de, bû hevseroka Desteya Aborî ya Cizîrê û roleke aktîv di desteyê de lîst û ji kar û xebata aborî ya herêmê re bû bersiv. Hevrîn têkoşîna xwe ya siyasî û çalakiyên bi rêya hevdîtina bi hemû civakê û aliyên siyasî re, da ku aloziya Sûriyê çareser bikin, berdewam kir.

**Hedefgirtina Hevrîn Xelef**

Bi êrîşên dewleta Tirk a dagirker, li ser heremên bakur û rojhilatê Sûriyeyê, di 9’ê Cotmeha 2019’an de, gelek kiryarên hovane ji aliyê komên çete yên girêdayî dewleta tirk a dagirker ve hatin kirin. Di roja sêyemîn a êrîşan de 12’ê Cotmeha sala 2019’an li ser riya M4 siyasetmedara jin di heman demê de Sekretera Giştî ya Partiya Sûriyeya Pêşerojê Hevrîn Xelef bû hedef û bi kemîneke plankirî hat şehîdxistin. Çeteyên girêdayî dewleta Tirk bi tundiyeke mezin û bi awayekî hovane Hevrîn Xelef îşkence kirin.

Bi boneya salvegera şehadeta siyasetmedara jin Hevrîn Xelef, sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Pêşerojê Sîham Daûd ji rojnemeya me re axivî.

Sîham Dawûd şehadeta Hevrîn Xelef bi daxmaya şermê li eniya mirovahiyê ye bi nav kir û wiha got: “9’ê Cotmehê bi destpêka êrişên dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmê jî wekî daxmaya şermê li eniya dîroka mirovahiyê ye, ji ber dewleta Tirk a dagirker herêm dagir kir, tevahî cureyên terorê, qetilkirin, tecawîzkirin û koçberkirin pêk anî. Her wiha heta fisfora spî ya qedexekirî jî bi kar anî. Hedefgirtina Hevrîn Xelef bandor li tevlêkirina jinên Sûrî ya qada siyasî kir. Lê li beramberê wê Hevrîn Xelef bû sembola jina siyasetmedar a azad. Gelek jinên li cîhan û Sûriyê bi Hevrîn Xelef bandor bûn. Xebata Hevrîn Xelef a têkoşerî bû meşele ji tevahî jinên Sûrî re.”

**‘Divê sûcdar bên darezandin’**

Sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Pêşerojê Sîham axaftina xwe wiha qedand: “Piştî şehadeta Hevrîn Xelef gelek dengên piştgiriya bi doza wê re bilind bûn. Lê belê tenê piştgirî têrê nake, her wiha divê dengên kesayetên jin ên serbixwe û rêxistinên navneteweyî yên piştevanî dan doza Hevrîn Xelef bibin yek, bi hemû hêza xwe hewl bidin doza wê rakirin dadgehên navneteweyî da ku sûcdaran darizînin. Erka niha berpirsiyariya dîrokî li ser milê me ku peyam û armancên Hevrîn Xelef pêk bînim. Em soz didin ku riya wê û tevahî jinên di oxira parastina doza welat û gel de canê xwe feda kirine , bişopînin. Ji bo avakirina Sûriyeke pirengî ya demokratîk û nenavendî bixebitin.”

## Ji Pênûsa Jin

**Li paytexta Tirkiyê çalakîkirin helwestekî bi rûmet bû**

Nehîr Pale

26 Îlonê sala 2022`an li Mêrsîn û 1`ê Cotmehê li paytexta Tirkiyê Enqere çalakî kirin têko?îna gelê Kurd gihand lûtkeyê. Her du çalakî nûnertiya berxwedan û têko?îna jina Kurd dike. Her 4 heval Rûken, Sara, Rojhat û Erdal bûn hebûn û vejîna dîroka gelê Kurd. Li hemberî êrî?ên dewleta Tirk a dagirker li ser jinê divê helwestên wisa xurt werin dayîn. Li herêmên dagirkerî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Efrîn, Girê Spî û Sere Kaniyê rojane jin têne ku?tin, revandin, tecawiz kirin û li herêmên dîtir jî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gelek Rêveber û fermandarên jin hedef hatin girtin.

Li Enqere û Mêrsînê çalakî kirin bersivekî rewa bû û divê hemû jinên Kurd li hemberî êrî?ên dewleta ?erê taybet Tirkiyê yên li ser jinê bibin xwedî helwest.

Dewleta Tirk a dagirker bi hiceta herdu hevalên ku çalakî kirine ji herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriye derbasî Tirkiyê bûne, hemû herêm bombebaran kirin. Ev êrî? dide diyar kirin ku dagikeriya tirk dixwaze gelê Kurd qirbike. Dewletên herêmî û navdewletî yên çalakiya Enqere ?ermezar kirin êrî?ên Tirkiyê yên li ser jin û zarokan rewa dibînin û destûrdayîna wan a ji Tirkiyê re ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bombebaran bike tê wateya ew jî hevkarê Tirkiyê ne.

Weke jin çalakiya ku rûmeta me parast divê em xwedî lê derbikevin û dema polîsên Tirkiyê carekê din destdirêjî jinê bike divê em hezar carî wî po?man bikin û bibin xwedî helwest. Tirkiyê dewleteke herî zêde êrî?î tevger û rêxistinên jin dike. Hîna hesabê komkujiyên xwe yên berê nedane niha jî bi heman rêbazan êrî?î gelan dike. Kî azadiya xwe bixwaze wê were darvekirin, kî parastina rûmeta xwe bike û daxwaza mafên xwe bike wê di komkujiyê re derbas bibe. Tirkiyê dewleteke ku hêviya guhertinê jê nayê kirin û polîtîkên xwe yên li hemberî gelan nade guhertin, ew sîstemeke ku gelan qir dike.

Ji me tê xwestin ku em li hemberî dewleteke ku exlaq û qanûn nasnake têbiko?in û ev yek mafê her civakekê ye. Polîtîka ku dewleta Tirk a dagirker li ser gelan dide me?andin gelo di çi de exlaqî û qanûnî ye. Herî zêde Tirkiyê zerarekî mezin dide jinê û rojane di nava hewldanan de ye ku jinê qir bike. Bi riya girtîgehan, huner û rojane buyerên ku diqewimin jin têne perçiqandin. Qanûnî jî tu zagon li Tirkiyê nînin ku maf bidin jinê yan jin bikaribe bi riya wan zagonan parastina xwe bike.

Eger em vegerin hunerê li Tirkiyê jin di astekî herî xirab de tê bi kar anîn. Ji bo jin ji siyasetê dûr bimîne, nebe xwedî nasname û daxwaza hebûna xwe neke bi riya hunerê wê di tariyê de dihêlin. Rew?a jinê li bajarên Tirkiyê gihî?tiye asta ku jin bi roj li ber çavên her kesî bi kêran tê ku?tin û deng ji kesekî dernakeve.


Ji xwe jina koçber li Tirkiyê dikin kole û didin bi kar anîn. Li dewleteke wisa ku dijminê jin û gelan e têko?în mafekî rewa ye û divê hemû jin bibin alîgirê vê têko?înê.



# Pirrengiya zimanê Kurdî

**Deriya Çiya/ Qamişlo**

Ziman pergalek ji sembol û nîşana ne ku amûra zimanî pêk tîne, ziman di hemî qadên cîhanê de wekî amûra herî girîng a têgihiştin û peywendiya di navbere endamên civakê de tê hesibandin. Di destpêka jiyanê de ziman nebû, mirov bi riya çavlêkirina lawiran bi qîran pêwendî dikirin, piştre îşaret, sembol û di dawiyê de jî bi xêzkirina tîpan mirov peywendî li gel hev didane çêkirin. Zimanê herî kevin di dîrokê de zimanê Somerî ye ku vedigere 3500 sal beriya zayinê. Bi demê re gelek zimanên cuda li cîhanê derketine ku Zêdetirî 7000 zimanî ne, her zimanek xwedî dîrok û dengê xwe ye. Li gor texmînên ku hatine destnîşan kirin, nêzîkî nîv melyon ji nifûsa cîhanê pirzimanî ne, ji ber vê yekê hejmara mutleq a kesên ku bi van zimanan diaxivin pir in. zimanê kurdî jî yek ji wan zimanên zengîn û resen e.




**Dîroka zimanê kurdî:**

Li gor hemû ziman nas û dîrok nasan zimanê Kurdî li gor tawangbarî û rêzimaniya xwe ji kok û binyata koma van zimanên Ariyan e. Bêguman, hebûn û zelalkirina zimanê Kurdî û pêşveçûna wê wek zimanê miletekî serbixwe bi qûnax û dema dîroka ku ew tê re derbas bûye, tê girêdan.

Di 700 B.Z de, zimanê Kurdî-Medî wek zimanekî Hindo-Ewropî cih girtiye. Li dora 150 salî bûye zimanê desthilatdariyê, ji (700-550) B.Z. Bandora zimanê Arî li van zimanên hevjîn hebû, nemaze piştî hatina Med û desthilatdariya wê li herêmê. Bêdudilî, em dikarin bêjin: Zimanê Kurdî yê îroyîn zimanekî Hindo-Ewropî, serbixwe ye. Zimanê Kurdî-Medî yê ku di 500 B.Z. ava bûye. Ew ziman zimanê ol, Rêbaz û desthilatdariya Medya bû. Diyar e, di vê demê de, zimanekî hevgirtî Gotî-Medî bê zarava domand. Ev zimanê hevgirtî Gotî- Medî li dora 1000 salî, ango ta bi sala 500 Z. dirêj kiriye. Bêguman, li gor çerxa dîrokê û piştî hilweşîna desthilatdariya navendî ya ramyarî, zimanê kurdî jî ber bi perçebûnê ve çûye. Nemaze piştî ku ketin bin desthilatiya fermandarên biyanî. Piştî vê qûnaxê, dema koçberkirine xelkên herêmê destpê kir, xelk ji cihê xwe bar kirin. Êl û hoz ji hev belav bûn. Xwesertiya kurdistanê ya çiyayî pir tir ew êl, hoz û xelkên herêmê ji hev dûr xistin. Danûstandin di navbera wan de qut bû. Li pişt her çemekî an çiyayekî ji çiyayên kurdistanê zaravayek bi serê xwe peyda bû. Bi pêşveçûna demê re zaravayên herêmî pirtir û firehtir bûn.

Rewşa penaberiyê û rewşa hêmanên ramyarî, erdîngarî, civakî û abûrî li kurdistanê, di gel dijwariya têkiliyan di nav êl û hozan de û tevlihevbûna hin êlên yek herêmê bi hev re çar zaravayên sereke peyda bûn. Nemaze di sala 1500 Z de, ev her çar zaravayên sereke ava bûn. Ew jî ev in:

Kurdiya Bakurî. Kurdiya Navîn. Kurdiya Başûrî. Kurdiya Goran.

**Zaravayên Kurdî:**

Di warê zaravayên kurdî de kevintirîn çavkanî Şerefnameya Şeref-Xanê Bedlîsî ye. Eşîr û civakên kurdan, ji aliyê ziman û rewşa civakî ve bi ser çar beşan de dabeş dike:

-Beşê yekê, Kurmancî (kurdiya Bakur/kurdiya jorîn).
-Beşê didiwan Lûrî (kurdiya Başûr/kurdiya jêrîn).
-Beşê sisiyan soranî (kurdiya navîn/kurdiya Rojhilat)
-Beşa çarem zazakî (Kirdkî/Kirmanckî/Dimilkî)
-Beşa pêncan Goran(Hewramî).

**-Kurmancî (Kurdîya Jorîn)**

Di zimanê Kurdî de zaravaya herî belavbûyî û mezin e. Li ser axeka fireh tê axaftin. Berhemên Kurdî (edebîyat, dîrok, muzîk) zêdetir bi zaravayê Kurmancî hatine nivîsandin û çapkirin. Li nav Kurdên Tirkîyeyê (zêdetir), Sûrîye û Qafqasyayê; li Îraqê û Îranê de tê axaftin. Ji % 68 kurd zaravayê Kurmancî bikar tînin. Devokên Kurmancî jî ev in:

-Kurmancîya Rojava: Kurmancîya alîyê rojavayê Çemê Feratê ye. Ji vê devokê re Berfiratî jî tê gotin. Ji herêma Efrînê dest pê dike heta Meletîyê (Riha, Mereş, Dîlok) tê axaftin.
-Rewendî / Bayezîdî / Serhedî: Kurmancîya Serhedê ji Erîwanê bigire, Qers, Agirî, Wan, Mûş, Erzerom, Erzinganê heta herêma Şikakîyan tê axaftin.
-Şikakî: Cîwarên di navbera gola Urmîyê (Mako, Xoy, Qotir, Dîlman, Saqiz, Serdeşt, Banê û Bokan) Gever, Elbak, Şemizînan û li herêma Navşarê tê axaftin.
-Şingalî: Li herêma Şêxanê û çîyayê Şingalê tê axaftin.
-Silîvî-Kîkî-Millî: Li Amedê, hinek deverên Mêrdînê, Riha û Xarpêtê tê axaftin.
-Botî (Bohtanî): Li bakurê Zaxoyê, Şirnex, başûrê Behra Wanê û hinek deverên Bidlîs, Sêrt, Êlih û Mêrdînê.
-Cizîrî: Li Cizîrê û deverên Mêrdînê, Midyad, Nisêbîn, Qamişlo, Şengal û Amûdê tê axaftin.
-Bahdînî (Bahdînanî): Li Dihokê û hinek deverên başûrê Botanê, Zaxo, Akrê, Zêbar û Amedîye tê axaftin.
-Hekarî (Şemzînanî-Şemzînî): Wek ji navê wê tê zanîn li Hekarîyê (Nehrî, Oremar, Gever) û li hinek deverên Şirnexê tê axaftin.
-Torî: Li deverên Kercewsê, Kerboran û Midyadê tê axaftin.

**-Lûrî (Kurdîya Jêrîn)**

Kurdên rojavayê Îranê bi vî zaravayî diaxivin. Zaravaya Kurdî ya duyemîn e. Kurdên rojavayê Îranê vê zaravayê diaxivin. Ji Melayîr, Qesra Şirîn û Kirmanşanê bigre heta Kendava Besrayê tê axaftin. Devokên Lûrî evin:

-Kelhûrî (Kirmanşanî): Li Kirmanşanê, hinek deverên Lûristanê, Gûran û Îlamê, li hinek herêmên başûrê Kurdistanê (wek Xaneqîn, Mendelî, Cesan, Kût, Bicar, Qurve, Hersîn) tê axaftin.
-Xaniqînî: Devoka Kelhûrî ya li Xaniqînê tê axaftin.
-Feylî: Kurdên şi’î bi vê devokê diaxivin. Li Îraqê ji aliyê Kurdên Feylî û li herêma Pahlayê, Bexdadê, Bedrê û li Lûristanê tê axaftin.
-Lekî: Devoka ku di bin bandora Farisî de maye, li hinek herêmên başûrê Kurdistanê û li dorhêla Kirmanşanê li ( Lekîstan, Lûristan, Îlam û Pahlayê) tên axaftin.
-Şêxbizeynî: Kurdên li Anatoliya Navîn (bi taybetî li Haymanayê) dijîn. Kurdên Şêxbizeynî ji Kirmanşan, Kerkûk, Xaniqîn û Silêmaniyê hatine Anatolîya Navîn. Eşîra Şêxbizeynîyan cî bi cî devokên cuda wek Kerkûkî, Lekî, Lûrî, Kelatî, Xewendî, Jirikî, Kuseyî, Silênî, Çelî ve Palanî diaxivîn.
-Sencabî û Babacanî: Ev devok ji alîyê êlên Sencab û Babacanî ve tê axaftin. Ev êl di herêmên Hawraman û Gûran de dijîn.
-Bextiyarî: Li başûrê Rohilatê Kurdistanê, li Daran, Mescîdê Silêman, Şehrê Kurd, Çarmihal, navçeya Piştgoyê tê axaftin.
-Perewendî, Kulgayeyî, Erusî (Gerûsî) û Zengeneyî: Ji devokên Kurdiya Başûr û Kurdiya Jêrîn in. Bi navên herêman û navên eşîran hatine binavkirin.
-Mamasanî: Li hinek deverên başûrê Kurdistanê û Lûristanê tê axaftin.

**-Soranî (Kurdîya Navîn)**

Zaravaya Kurdî ya sêyemîn e. Wekî Kurdîya Navîn û Babanî jî tê binavkirin. Bi vê zaravayê jî gelek berhemên girîng hatine afirandin. Li başûrê Kurdistanê (li herêma Silêmanîye, Kerkûkê û Îranê) tê axaftin. Bi gelemperî berhemên Soranî bi alfabeya Erebî hatiya nivîsandin. Devokên Soranî jî ev in:

-Soranî: Herêma Zêbarê li her deverên Hewlêrê tê axaftin.
-Silêmanî/Babanî: Li Silêmanîyê, Kerkûkê û hinek deverên Xaniqînê tê axaftin.
-Mukrî/Mukrîyanî: Li Şino, Nexede, Xane (Piranşar) Sanqele, Banê, Seqiz, Serdeşt û Mahabadê tê axaftin.
-Sineyî: Li Bicar, Kengewer, Rewanser, Ciwanro, Sine û bakurê Ciwanroyê tê axaftin.
-Germîyanî: Li başûrê Kurdistanê, li hinek deverên Kerkûkê û li derdora Xaniqînê tê axaftin.
-Erdelanî: Li Rojhilatê Kurdistanê, li derdora Sine, Rewanser û Ciwanroyê tê axaftin.

**-Zazakî (Kirdkî/Kirmanckî/Dimilkî)**

Zaravaya Kurdî ya ku li çend deverên Tirkîyeyê tê axaftin. Çend bajarok û navçeyên wekî Çewlikê, Dêrsimê, Dîyarbekirê, Elezîzê, Sêwazê, Mûşê, Erziromê, Ezirganê, Rihayê, Semsûrê, Sêrtê, Qeyserî û li Meletîyê tê axaftin. Devokên Zazakî ev in:

-Devoka Dêrsimê: Li Dêrsimê, Ezirganê, Erziromê (hinek gundên Tatos û Xinûsê), Mûş (Gimgimê) û Siwasê bi gelemperî Kurdên Elewî diaxivin.
-Devoka Derveyî Dêrsimê: Çewlîg, Dîyarbekir, Elezîz, Riha û li çend deverên din Kurdên Sunî pê diaxivin.

**-Goranî (Hewramî)**

Li Îranê (herêma Kirmanşanê) û li hinek heremên Başûrê Kurdistanê tê axaftin. Mirov dikare bibêje di navbera Kirmanşanê û Bexdadê (li herêmên çîyayî) tê axaftin. Li gorî deng û sazîya bêjeyan nêzîkî zaravaya Zazakî ye. Ji ber vê yekê di dabeşkirina zaravayan de bi gelemperî wek devokek di nav Zaravaya Zazakî de hatiye dabeşkirin. Lê belê, ji ber ku herêmên tê de tê axaftin dûrî hev in û ji alîyê pêşesazî û dengsazîyê de cudahiyên bingehîn di navbera her du zaravayan de hene divê ji hev cuda bên hesibandin. Devokên Goranî jî ev in:

-Hewramanîya Textî: Devoka li herêma çîyayê Hewramanê ya alîye Îraqê, bi taybetî li derdorê Helebçeyê (Awa, Biyare, Tewêle) tê axaftin.
-Hewramanîya Lihonî: Hewramanîya li alîyê Îranê li Paweh, Newsûd, Dizlî, Nodse, Dînewer, Zengene, Siyamensûr û Şêxan tê axaftin.
-Bacelanî: Bi taybetî li Xaneqîn û Mûsilê, Kamjaran, Şêrwan, Qela, Qeysewend, Maraw û Kemangerê tê axaftin.
-Zengeneyî: Li Zengene û Şebekê tê axaftin.
-Şebekî: Li derdorê Mûsilê te axaftin.
-Şêxanî: Berê li deverên Helebçeyê dihat axaftin.
-Sarlî: Li bakurê Mûsilê di herêmeke piçûk de tê axaftin.

Li Kurdistanê li gorî texmînan ji % 68 Kurmancî (Kurdîya Bakur û Kurdîya Jorîn), ji % 16 Lûrî (Kurdîya Başûr û Kurdîya Jêrîn), ji % 12 Soranî (Kurdîya Navîn û Kurdîya Rojhilatê) û ji % 4 jî Zazakî û Goranî tê axaftin. Zaravaya ku herî zêde di Kurdistanê de tê axaftin Kurmancî ye. Di wêje û nivîsê de zaravayên Kurmancî û Soranî xurt û geş bûne û pêş ketine.

**Standardkirina zaravayên zimanê kurdî:**

Standardkirina zimanê Kurdî ya ku di sedsala 20’an de hatiye kirin bi sê alfabeyên cûda de hatine nivîsandin. li Başurê Kurdistanê û li Yekîtîya Sovyeta kevin bi desteka fermî û li Bakurê Kurdistanê jî bi insîyatîfa rewşenbîrê Kurd Mîr Celadet Bedirxan bizavên standardîzekirina zimanê Kurdî dest pêkiriye. Bizava standardîzekirina zaravayê Kurmanciya Bakur di bin pêşengtiya Mîr Celadet Bedirxan de gava yekem di kovara “Hawar” da, ya ku li Şamê û Beyrûtê di navbera salên 1932-1943 hatiye çapkirin û bikaranîn. Alfabeya Celadet Bedirxan ya nûjen ji tîpên Latînî hatiye nivîsandin. Ji bo standardîzekirina zimanê Kurdî pêwîstî bi rêbazek nûjen, li gor wê serdemê û li gor rastiya netewa Kurd ya îro heye. Bêgoman ji bo nûjenkirin û standardîzasyona Kurdîyê girîng e ku ji zengîniya hemû zaravayan sûd bê wergirtin.

# ‘Hêza Parastina Civakî misogeriya hebûna civakê ye’

Pişt destpêkirina Şoreşa 19’ê, ji bo parastin û rêxistinkirina civakê, Hêza Parastina Civakî HPC’ê li Rojavayê Kurdistanê hat avakirin û ji bo xizmeta civakê gelek kar û xebat da meşandin. Yek ji Rêveberê Hêza parastina civakî ya bajarê Qamişlo Nebîl Ismayîl HPC’ê parastina nirx û nasnameya civakê dike.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Çanda berxwedana dîrokî a gelê Kurd di roja me ya îro de jî li her çar aliyên Kurdistanê berdewam dike. Gelê Rojavayê Kurdistanê ku felsefeya jiyanê ya Rêber Abdullah Ocalan esas digire, piştî şoreşa Rojava rastî gelek êrîşan hat û heta niha jî ev êrîş dewam dikin. Li dijî êrîşên hov gel parastina xwe ya cewherî ava kir û di her qada jiyanê de xwe bi rêxistin dike, herwiha rê nade şikandina vîna gel a berxwedêr. Gelê bakur û rojhiltaê Sûriyê pêşxistina parastina xwe a cewherî weke pêdiviyeke herê bingehîn dibîne. Bi tecrûbeyên şoreşa Rojava re parastina cewherî hebûna xwe li her qadê de diparêze.

Derbarê kar û xebatê Hêza Parastina Civakî HPC’ê, yek ji rêveberên Hêza Parastina Civakî ya bajarê Qamişlo Nebîl Îsmaîl ji rojnama me re axivî.

Nebîl Îsmaîl diyar kir ku Hêza Parastina Civakî di dawiya sala 2013`an de, ji parastina civakê hat avakirin û wiha got: “Piştî destpêkirina şoreşa 19’ê Tîrmehê, li ser bingeha xweparastinê, ji bo parastin û rêxistikirina civak, Hêza Parastina Civakî hat avakirin. Ev hêz bi avabûna komîna yekem re, cihê xwe di komîteya parastinê ya komînê de cih girt.Pişt wê Hêza Parastina Civakî kar û xebatên xwe berfireh kir û ji bo rêxistinkirin û parastina civakê kar û xebatên girîng dan meşandin. Di dema avakirina Hêza Parastina Civakî de tevî ku derfetên me ne zêde bûn, lê gel bi rihê berrxwedêr xwe diparast. Herwiha piştî ku hêzên Ewlekariya hundirîn û leşkerî hatin avakirin, wê demê hêza parastina civakî vegeriya armanca xwe ya sereke, ew avakirina civakek sincî û polotîk e.”



### ‘Jin û mêr bi hev re civakê diparêzin’

Nebîl Îsmaîl di dewamiya axaftina xwe de tekez kir ku Hêza Parastina Civakî li ser bingeha isteratîjiya Şerê Gelê Şoreşgerî civakê diparêze û wiha got: “Di Şerê Gelê Şoreşgerî de, gel şoreşê dimeşîne û berxwedanê dike. Li ser wê bingehê Hêza Parastina Civakî ev erk girt ser mile xwe, herwiha ji bo perwerdekirina civakê li ser rêbazê şerê gelê şoreşgerî gavên girîn avêt û ji sedî 70’ê gel hatiye



perwerdekirin. Armanca sereke jî ku karibin li hemberî êrîşên ku li ser gel tên kirin xwe biparêzin. Êrîşên ku li ser bakur û rojhilatê Sûriyê tên kirin, ne tek alî ne, lê gelek aliyê wê hene. Ji bo ku em bibin bersiv ji êrîşan re divê em li ber xwe bidin, herwiha gel jî nas kiriye êrîş ne tenê li ser hêza leşkerîye, li ser hebûna gelê bindest e, di nav de jî gelê kurd, li ser wê bingehê jî gel bi parastina hêza civakê re hevgirtiye, ew jî encamê perwerdeyan e. Hêzê parastina civakî ji temen 7 heya 70 saliye, ne tenê şervanekî digire nava xwe, tevahî pêkhateya digire nava xwe, di heman demê de jin jî cihê xwe di nava hêza parastina civakê de digire. Rola jin di parastina êrîş, zimanê, çand, sinc û şerê taybet ku li ser wê tê meşandin heye. Jin di hemû qadên jiyanê de cihê xwe digire. Di nava hêza parastina civakî de jin û mêr bi hev re xwe û civaka xwe diparêzin. Hêzê parastina civakî karekî baş di aliyê rêxistinkirin û pêşxitina civakê de kiriye.”

### ‘Gel li xwe xwedî dernekeve kes lê xwedî dernakeve’

Rêveberê Hêza Parastina Civakî Nebîl Îsmaîl axaftina xwe wiha qedand: “Astengî pir li pêşiya me dernakevin ji ber karê me hemû hiziriye, tenê astengiyê ku em dikişînin dema ku mirovek nezan be, ji ber nezanîbûn mûsîbeta cîhanê ye û tiştê ku mirovan têk dibe fêlaketa nezanbûnê ye. Êrîşên ku tên kirin destpêkê kesê nezan dike hedef, ji bo wê em wek hêzê parastina civakî kesên nezan perwede dikin. Herwiha di gotina xwe ya dawî de ez dixwazim bêjim wê êrîş li ser gelê kurd û taybet bakur û rojhilatê Sûriyê di milê şer, êrîş, şerê taybet berdewam bin, ji bo wê heger gel li xwe xwedî dernekeve kes lê xwedî dernakeve.”

# ‘Navenda Ehlen Simsim cihê pêşxistina zarokan e’

**Navenda nûçeyan**

**Berpirsa Navenda Ehlen Simsim Nisrîn Hisên diyar kir bi armanca fêrkirin û pêşxistinan zarokan, herwiha başkirina pîskolojiyê wan, di sala 2022`an de navendên Ehlen Simsim hatin vekirin.**

Di 22`ê Îlona 2022`an de 7 navendên Ehlen Simsim yên zarokan ku girêdayî Desteya Jinê a Rêveberiya Xweser e hatin vekirin; Li Qamişlo 2 navend, li Tirbespiyê 2 navend, li Çilaxa navendek, li Amûdê navendek û li Dirbêsiyê jî navendek. Armanca sereke ji vekirina van navendan fêrkirina zarokan û başbûna piskolojiya wan.

Derbarê kar û xebatên Navenda Ehlen Simsim a bajarê Qamişlo, berpirsa wê Nisrîn Hisên û zaroka bi navê Welaa Faûr ji rojnama me re axivîn.

### ‘Em zarokên ji temenê 3’ê heta 8 salî pêşwazî dikin’

Nisrîn Hisên diyar kir ku Desteya Jinan a Rêveberiya Xweseriya di navbera salên 2022` û 2023`yan de 7 navend bi navê Ehlen Simsim vekirin û wiha got: “Di 22`ê



**Nisrîn Hisên**

Îlona 2022`an de navendên Ehlen Simsim ya girêdayî Desteya jinê hatin vekirin. Navendên Ehlen Simsim zarokên ji temenê 3`ê heta 8 salî pêşwazî û perwerde dike. Her wiha zarokên astengdar jî pêşwaz dike, perwerdeya ji bo zarokên astengdar li gorî du beşan têne dayîn, beşa yekem taybet bi korsên navendê ye, ku tê de çalakiyên cûrbecûr tên dayin, ya din jî da ku zarok karibin tiştên di mejiyê xwe de bînin ziman û têkiliyên wan bi derdorê re pêş bikeve. Ji xwe di demsala havînî de zarok zêde tên û navend vekiriye. Di distpêka dibistana de em zarokan nû pêşwaz dikin, her du mehan beşek ji zarokên nû pêşwaz dikin, em dixwazin hijmareke baş ji zaroka werin, ji ber ku ev navend derfetek ji zarokên koçber ku malbatên wan koçber bûne ye, ji bû wê em zarokên ku koçber bûne pêşwaz dikin û ji hemû pêkhateyan qebûl dikin.”



**Welaa Faûr**

### ‘Em zarokan fêrî çalakiyên cûrbicûr dikin’

Nisrîn Hisên di dewama axaftina xwe de da zanîn ku ew zarokan fêrî çalakiyan dikin û got: “Hijmara zarokên ku di navendê de hene 40 zarokin, li ser 2 refantên belavkirin, her refek jî 2 berpirsên wê hene, ji xwe em zarokan fêrî çalakiyên cûr bi cûr dikin; mîna tiştên rotînî, civakî û naskirina zarokan ji malbatê re, paqijî, hevaltî, rêzgirtin, çalakiyên fîzîkî, xwendin û fêrkirina hejmara bi kurdi û erebî, heger giropa zarokan kurd bin bi Kurdî wan fêr dikin û heger erebî be bi Erebî fêr dikin. Herwiha heger derfet hebe em çalakiyên Terfîhî jî didin, ji ber em naxwazin sîstema me hemû yek be û rewşa şer a herêmê bandorên wê li ser zarokan bike, em dixwazin piskolojiya zarokan biguherin.”

### ‘Em hewil didin ku zarok ji zaroktiya xwe ne qut bin’

Berpirsa Navenda Ehlen Simsim Nisrîn Hisên axaftina xwe wiha qedand: “Armanca me ya sereke ku em zarokan ji rewşên ku em tê re derbasdibin dûrbixin, herwiha kêfxweşiyekê ji wan re ava bikin, piştgiriya piskolojî bidin zarok û malbatan. Di van rewşên ku herêma me tê re derbas dibe gelek zarok rewşên piskolojîk û tewehid bi wan re çêbûn, ji bo wê em dixwazin zarok jiyana xwe ya zarokatî jiyan bikin. “

‘Civakbûn ji mirovan re bingehe’

Di heman çaroçove de zaroka bi nave Welaa Faûr yek ji zarokên navenda Ehlen Simsim kêfxweşiya xwe ji vekirina navendê re anî ziman û got: “Ez gelek kêfxweş dibim dem ku ez têm navendê, herwiha wêneyan çêdikim û fêrî çalakiyên cûr bi cûr dibim, bi taybet dema ku min çalakî li ser civakbûnê sitend pir jê fêde kir, ji ber civakbûn ji mirovan re bingehe. Ez dixwazim dema ku ez mezin bibim ez jî bibim mamoste, ji bo ku zaroka fêrî xwendin û nivîsandinê bikim.”





# Bayik : Têkoşîna gelê kurd wê azadiya Rêber Apo misoger bike

Hevserokê Konseya Rêveber a KCK’ê Cemîl Bayik di salvegera 25’an a Komploya Navneteweyî ya 9’ê Cotmehê de destnîşan kir ku bi têkoşîna gelê Kurd wê azadiya Rêber Abdullah Ocalan misoger bibe û komplo biqede.

**Navenda nûçeyan**

Nirxandina Hevserokê Konseya Rêveber a KCK’ê Cemîl Bayik wiha ye: Yek ji taybetmendiyên sereke yên Rêber Apo, têkiliya ku bi gelê Kurd re daniye. Bi çavdêriyeke giştî bi hêsanî tê fêmkirin ku di navbera gelê Kurd û Rêber Apo de têkiliyeke gelekî xurt heye. Têkiliyeke wisa xurt çêbûye ku gelê Kurd bêyî Rêber Apo nikare hebûna xwe bifikire. Bi têkiliya xwe ya bi Rêber Apo re hebûna xwe pênase dike û bi wate dike. Hebûn û azadiya xwe weke hebûn û azadiya Rêber Apo dibîne. Nêzîkatiya li Rêber Apo weke nêzîkatiya li xwe dibîne. Rêber Apo xwe bi tevahî kiriye aîdî gel. Ji ber ku gelê Kurd vê dizane, bi vî rengî nêzî Rêber Apo dibe û pê re dibe yek. Ev rewş di kiryar û axaftinên gel de xwe dide der. Dirûşma ‘Bê Serok Jiyan Nabe’ ji hêla gelê Kurd ve hatiye afirandin. Gelê Kurd her roj bi vê dirûşmê, bi wateya wê re radizê û radibe. Herî zêde vê dirûşmê berz dikin, li dora wê tên cem hev û hebûna xwe pê tînin ziman. Dirûşm girîng in. Bûyîna dirûşma gel ne rewşek wisa asayî ye. Dirûşm wateyek bîrdozî û siyasî radigihîne. Têkiliya wê bi civakbûn, hebûn û azadiya civakê re heye. Dirûşm axaftinên ku tê de daxwaza azadiyê tê vegotin. Ji ber vê yekê ew ramanek e. Pirsgirêkên hebûn û azadiyê yên gelê Kurd jî hene. Gelê Kurd di bin gefa qirkirinê de ye. Dixwaze vê metirsiyê ji holê rake. Ziman, nasname û çanda xwe azad bijî, îradeya xwe azad nîşan bide û bijî. Ya ku ew ji bo vê şer dike ev e. Ji bo vê heta niha bedelên mezin daye. Niha jî ew berdêla xwe didomîne. Ji ber ku bê têkoşîn azadî nabe. Gelê Kurd vê herî baş dizane. Loma jî bi her awayî dev ji têkoşînê bernade. Gelê Kurd Rêber Apo xiste navenda vê yekê.

### Têkiliya di navbera gelê Kurd û Rêber Apo de

Ji bo ev dilsoziya di navbera gelê Kurd û Rêber Apo de bê fêmkirin, têgihîştina fikir û felsefeya Rêber Apo gelekî girîng e. Ji ber ku bêyî vê têgihiştinê ne mimkûn e ku Rêber Apo rast û tam were fêmkirin. Ji ber ku ev têkilî bandoreke diyarker li ser hemû geşedanan kir. Ev têkilî li ser xet û pêşketina têkoşîna azadiyê bandoreke pir diyarker dike. Nêzîkatiya Rêber Apo ya li gel û helwesta gel di pêşketin û teşegirtina PKK û têkoşîna azadiyê de roleke diyarker lîst.

Di mînaka Rêber Apo de tê dîtin ku bi gel re têkiliyên rasteqîne danîn ne tiştekî asayî û hêsan e. Bi taybetî di rastiya kurdan de xwestin û bidestxistina vê pir zehmet e. Li aliyekê tirs, rizîn û biyanîbûna ku mêtingeran avakiriye, li aliyê din jî bandora çanda jiyana takekesî ya modernîteya kapîtalîst li pêşiya pêşketina têkiliyan de astengiyeke cidî ye. Derbaskirina van hemûyan, rûbirûbûna tirs, zordarî û ferzkirina mêtingeriya qirker û redkirina derfetên jiyana takekesî ya modernîteya kapîtalîst û esasgirtina rastiya gel û tercîhkirina jiyan û çanda wan ne tiştekî ku bi hêsanî biryar bê girtin û bi ser bikeve. Ji bo vê jî nêzîkatiyeke bi biryar û prensîb pêwîst e. Ji ber vê mînaka wekî têkiliya Rêber Apo û gelê Kurd zêde nînin. Bi taybetî jî têkiliyên bi vî rengî di cîhana îroyî de nînin. Bûyerên bi vî rengî bi piranî di dîrokê de, di bûyerên ku mijara stran û destanên gelerî yên gel de tenê tê dîtin. Jixwe tê dîtin ku gelê Kurd bi awayekî xurt di stranên gelêrî, destan, çand û hunera xwe de cih dide Rêber Apo. Ev mijarên pir girîng in û pêwîst e mirov li ser wateya wan a ji bo civakekê bisekine, têbigihêje û were fêmkirin.

Bingeha têkiliya gelê Kurd û Rêber Apo bêguman ji ber nêzîkatiya Rêber Apo ya li hemberî gel e. Rêber Apo rastiya gel dît û ji ber vê gel esas girt. Wî gel wek pîvana heqîqetê didît. Ev nêzîkatiya Rêber Apo girîng e. Divê ev weke tu nêzîkatiyên din neyê dîtin. Di vê nêzîkatiyê de wateyên kûr ên dîrokî û civakî hene.



### Helwesta gelê Kurd li dijî tecrîda li ser Rêber Apo

Helwesta gelê Kurd a li hemberî tecrîd û pergala îşkenceyê ya Îmraliyê jî eşkere bû. Sîstema tecrîd û îşkenceya Îmraliyê di çarçoveya kompolya navneteweyî de hat pêşxistin. Dema ku girêdana di navbera gelê Kurd û Rêber Apo de bi komployeke navneteweyî nehat şikandin, dijmin û hêzên komploger ji bo vê pêk bînin sîstema Îmraliyê pêş xistin. Lê gelê Kurd bi çalakiyên bênavber li çar parçeyên Kurdistanê û li her cihê ku lê ye, ev armanca dijmin û hêzên komploger pûç kir. Ev helwesta gelê Kurd 25 sal in berdewam dike. Bi gelek kampanya, tevger û helwest û çalakîyan berdewam kir. Li aliyê din çalakiyên piştevaniya bi Rêber Apo re her ku diçe zêdetir dibin û yên ku xwe weke dostên gelê Kurd dibînin hema bêje li hemû cîhanê li dijî tecrîda li ser Rêber Apo û misogerkirina azadiya fîzîkî çalakî li dar xistin. Bi vî rengî doza gelê Kurd a hembêzkirina Rêber Apo li hemû cîhanê belav bû û ji çar aliyên cîhanê piştgirî girt. Bêguman ev pêşveçûnek mezin e. Niha gelê Kurd di dawiyê de diyar kir ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo armanc dike û dest ji vê bernade û bi destpêkirina pêvajoyeke bi vî rengî îradeya xwe ya ji holê rakirina kompolya navneteweyî ji bingehê û bidawîkirina wê nîşan da. Ev helwesta gelê Kurd ji aliyê gelên bindest, jin û hemû hêzên demokratîk ên Rojhilata Navîn û cîhanê ve bi coş tê destekkirin. Gelê Kurd û dostên wan li ser vê yekê nîqaşan dikin ku wê çawa vê pêvajoyê pêş bixin û bi pêvajoyeke nû bigihînin encamê. Ev helwest teqez wê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo misoger bike û kompolya navneteweyî bi temamî biqedîne. Weke tevger em ê heta dawiyê piştgiriyê bidin vê helwestê. Tişta ku divê em li dijî tecrîda mutleq a dijmin ferz bikin ew e ku em vê helwestê hîn bi pêş bixin û bi awayekî herî xurt nîşan bidin.

# Hiqûqnasê Misrî: Sûcên Tirkiyeyê wekî yên DAIŞ’ê ne

**Sekreterê giştît yê berê yê Meclisa Mafên Mirovan a Misirî-Erebî Hiqûqnas Şerîf Nadî destnîşan kir ku sûcên dewleta Tirk a dagirker li pergala Erdogan tiştekî nû nîn e û ji bo êrîşên wê yên dawî got: “Ev sûc wekî sûcên rêxistinên terorîst ên weka DAIŞ’ê û Cebhet El Nusra ne.”**



Bertekên li hemberî êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên dijî navendên xizmetguzarî û enerjiyê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê zêde dibin.

Sekreterê giştî yê berê yê Meclisa Mafên Mirovan a Misirî-Erebî Şerîf Nadî têkildarî mijarê got ku dewleta Tirk a dagirker navendên stratejîk ên kehrebe û avê bombebaran dike, lewma nexweşxane û navendên tenduristiyê radiwestin, bi taybetî sivîl ziyanê dibînin û ev jî bi serê xwe sûcekî şer e.

### ‘Di pergala erdogan de ev tıştekî nû nîn e’

Nadî bal kişand ser Lihevkirina Cinevê ya 1949`an a ji bo parastina sivîlan di şeran de û got: “Lihevkirina Cinev qedexe dike ku navendên giştî, bi taybet nexweşxane û navendên tenduristiyê bên hedefgirtin. Binpêkirina qanûnên navnetewî û sucên şer ên ji aliyê Tirkiyeyê ve, di pergala Erdogan de tiştekî nû nîn e. Li gorî raporan destê hikûmeta Tirkiye û milîsên wê yên li Sûriyeyê di guhertina demografîk, kuştina kesên ji nasname û baweriyên cuda, girtin, revandin û tecawîzkirina jinan ên li herêmên Efrîn û yên din de heye.”

Nadî bêdengiya navneteweyî ya li hember sûcên dewleta Tirk a dagirker rexne kir û got: “Ev bêdengî, rê dide ku Tirkiye siyaseta xwe ya li dijî pîvan û qanûnên navneteweyî bidomîne. Ev sûc wekî sûcên rêxistinên terorîst ên weka DAIŞ û Cebhet El Nusra ne.”

Şerîf Nadî di wê baweriyê de ye ku domandina pergala Erdogan û



bêdengiya navneteweyî dê bextreşiyê bîne Rojhilata Navîn û wiha dom kir: “Siyaseta kuştin, topbarankirina ketober, ewlehiyê nayîne Tirkiyeyê. Zemîna derxistina tevliheviya li herêmê zêde dike. Ev jî atmosfereke guncew ji komên terorîst re ava dike ku sûcên din li herêmên pêk bînin.”

Şerîf Nadî di dawiya nirxandinên xwe de diyar kir ku pêwîst e li hember sûcên dewleta Tirk a dagirker bê sekinandin û got: “Ev ne tenê ji bo Kurdên ku li hember terorê sekinîn û cîhan ji xirabiyên DAIŞ`ê xilas kirin; ji bo tevahiya cîhanê jî girîng e. Di girtîgehên QSD`ê de bi hezaran DAIŞ`î hene, berdewamkirina êrişan derfetê ji wan re çêdike ku birevin. Heke ev yek pêk were, dê cîha tevahî berdêlên giran bide.”

# MSD’ê ji bo rawestandina êrişan banga destwerdanê kir

**MSD’ê dagirkeriya Serêkaniyê û Girê Spî û êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê şermezar kirin û bang li civata navneteweyî kir ku destwerdanê bike û êrişan rawestîne.**

Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) di salvegera dagirkirina Serêkaniyê û Girê Spî de, bang li Rûsya û dewletên Koalîsyona Navneteweyî kir ku xwedî li berpirsiyariya xwe derkevin û êrişên li dijî herêmê rawestînin.

MSD`ê di daxuyaniya xwe de berdewamkirina êrişên dagirkeriyê li dijî herêmên Serêkaniyê û Girê Spî, parêzgehên Hesekê û Reqayê di salvegera 4`an a destpêkirina êrişên dagirkirinê ji aliyê dewleta Tirk ve, şermezar kirin.

Her wiha meclisê, êrişên dijminane yên dagirkeriya Tirk çi bi rêya balafirên şer an jî dronan û hedefgirtina binesaziya herêmê û navendên enerjiyê şermezar kir.

Di daxuyaniyê de meclisê diyar kir ku êrişên berdewam bi awayekî trajedîk bandor li jiyana zêdetirî 5 milyon kesî kirin.

Meclisê bang li civata navneteweyî kir ku kiryarên dijminane yên dewleta Tirk şermezar bike, destwerdanê bike, êrişan rawestîne, şênî, binesazî, navendên stratejîk û xizmetguzarî biparêze.

Her wiha meclisê bang li dewletên ereb kir ku li hember sûcên dewleta Tirk a dagirker helwesteke cidî nîşan bidin.

Meclisê bang li Rûsya, Koalîsyona Navneteweyî ya têkoşîna li dijî DAIŞ`ê di serî de DYA û Brîtanya û Fransyê kir ku berpirsyariyên xwe bînin cih û ji bo rawestandina êrişan û parastina herêmê gavên çalaktir biavêjin.

Meclisê sersaxî da malbatên şehîdên Hêzên Ewlekariya Hundirîn, Akademiya Têkoşîna li dijî Hişbirê yên ku ji aliyê Koalîsyona Navneteweyî ve dihatin perwerdekirin. Her wiha ji birîndaran re şîfaya acil xwest.

Meclisê teqezî bi mafê gelê herêmê ku di nav aştî û aramiyê de bijî kir û diyar kir ku çareseriyên aştiyane û giştî bibînin û bang li tevahî aliyên têkildar kir ku hevkar bin û çareseriya siyasî li Sûriyeyê pêk bînin.

# Xerîb Hiso: Armanca êrîşan qirkirina gelên azadîxwaz e

Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk Tev-Dem Xerîb Hiso diyar kir ku armanca êrîşên dewleta Tirk ya dagirker qirkirina gelê kurd û têkbirina pergala Rêveberiya Xweser e. Herwiha da zanîn ku civaka nevdewletî ji bo berjewendiyê xwe li hemberî êrîşan bê denge.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û Başûrê Kurdistanê, herwiha armancên êrîşan û bêdengiya navnetweyî, hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk (Tev-Dem) Xerîb Hiso bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**1-Dewleta Tirk a dagirker roj bi roj êrîşên xwe yên li dijî gelên herêmê û destkeftiyên gelan zêdetir dike, armanca dagirkeriyê ji domandina êrîşên ser herêmê çi ye?**

-Êrîş li ser bakur û rojhilatê Sûriyê ji destpêka şoreşa Rojava ve bê navber ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker ve dewam dike, lê piştî dagirkirina bajarê Efrîn, Girê Sipî û Serê Kaniyê êrîşên dagirkeriyê yên ser herêmê girantir û zêdetir bûne. Dewleta Tirk ya dagirker ji bo ku siyaseta qirkirinê bimeşîne her çar parçeyê Kurdistanê dike hedef, herwiha li ser aliyê civakî, aborî, çandî, sincî jî êrîş dike. Dewleta Tirk di kirîzeke aborî , siyasî û civakî ya giran de derbas dibe, ji bo ku li ser kirîzên xwe binixumîne îrîşî gelê kurd dike. Êrişên dagirkeriya Tirk yên ku li ser herêmê Parastina Mediya pêk tên, armanc jê têkbirina îradeya gelê Kurd e. Lê bi berxwedana Gerîla artêşa Tirk a dagirker derbeyên giran dixwe û lawaz bûye. Gerîla di vê sedsala nû de pêşengtiya şoreşekî mirovatî di asta cîhanê de dike. Şoreş li ti welatan tuneye tenê di hundirê Kurdistan de, bi taybet li bakur û rojhilatê Sûriyê şoreşek temsîla îrada gelan dike û hêzeke xwedî pîvane heye, ji bo wê jî dewleta Tirk ya dagirker gef, êrîş, komkujî û pilanê xwe kêm nake û biryara qirkirinê daye. Lê beramberî êrîşên qirkirinê berxwedana ku tê meşandin destan dîrokî yûn nû yên berxwedanê tên nivîsandin.Bi berxwedanê rûyê faşîzmê û hefkarên wê tê xuyakirin ji raya giştî re.

**2-Dewleta Tirk a dagirker li kêleka êrîşên qirkirinê yên leşkerî, li dijî gel û civakê şerekî taybet jî dide meşandin, hûn vê yekê çawa dinirxînin**

-Dewleta Tirk bi awayekî eşker dewleteke dagirker e. Niha dixwaze Impratoriya Osmanî ji nûve vejîn bike û tevahiya herêmê dagir bike. Lê wekî di dîrokê de eşkere bûye, herdem îradeya gelan li beramberî hêzên dagirke bi ser dikeve û dagirker têk diçin. Dewleta Tirk ya dagirker di qirkirina gelan de xwedî tecîbeyek mezin, herdem siyaseta qirkirinê li dijî tevahiya gelan dide meşandin. Herdem hewil dide ku guhertina demografî pêk bîne û gelê resen qir bike. Dagirkeriya Tirk ji bo ku bighêje armanca xwe tevahiya şêwazan pêk tîne, bi siyaseta şerê taybet, Şerê leşkerî û aborî dixwaze gelan ber bi qirkirinê ve dibe. Berê di herêmê de Aşûr, Siryan, Keldan, Kurd û Ereb hebûn, herwiha di nava kurdan de êzîdî, elewî û zerdeştî jî hebûn, lê îro ji van gelan tenê kurd li ser lingan maye, kurd jî gelek komkujî li ser wan hetine kirine û fermanên bi serê êzîdiyan hatin kirin, ne kêmtirî komkujî ku bi serê ermenî û aşûriyan de pêk hatî. Çi siyaset li hemberî îrada gelan daye meşandin li hember îrada gelê kurd jî daye meşandin, heta roja îro ev siyaset dewleta tirk ya dagirker bernedaye ji ber ew neviyên osmaniya ne. Di vê demê de êrîşê ku têne kirin sînorgirtin û dorpêçkirina îrada gelên demokratîk e ku çandên cuda li hev kom kirine û bi demokrasî jiyan birêve diçe. Ji bo wê dewleta Tirk ya dagirker ol dike hinceta xwe ku êrîş bike. Li dewletên rojavayî pirsgirêka Netew û olperstî hatiye derbaskirin, sîstema netewiyetî jiyan dikin, netewiyet çand û exlaqan tîne cem hev, lê qewmiyet yek çand, ziman û ale ev yek jî xetere. Dewleta Tirk, Îraq, Îran û Sûriyê di nava şerekî mezin de jiyan dikin, ji ber zihniyeta qewmiyetê bi kar tînin. Sîstema netewa demokratîk bi rihekî welatparêziya rast ku xwedî cewher, pîvan û since, li hemberî vê jî çiqasî dijmin êrîşî îrada van gelan bike û şerê taybet, leşkerî û embargo dide meşandin,nikare bi ser bikeve.

**3- Dewleta Tirk a dagirker li pêş çavê cîhanê sûcên dijmirovî dike û tevahiya pîvan û zagonên mafê mirovan binpê dike, li hemberî van sûcan jî tevahiya rêxistin , sazî û destgehên mafê mirovan bêdengin. Hûn bêdengiya cîhanê ya li hemberî sûcên dagirkeriyê çawa dinrxînin ?**

Dema mijar dibe gelê kurd bi giştî bêdengiyek civaka navdewletî derdikeve. Dema ku mijar ne kurd be civaka nevdewletî dibe xwedî helwest li hember bûyerê ku derdikevin. Çiqas bengewazî tên kirin ji bo bêdengiya civaka navdewletî bê şikandin, lê heta roja îro nehatiye şikandin. Ev bêdengî jî ji dema ku kompiloya navneteweyî û heta niha berdewam e. Niha terzê jiyanê ku li bakur û rojhilatê Sûriyê heyî, bi pêşengtiya jina azad tekoşînek pir mezin tê kirin, rastiya şoreşê li bakur û rojhilatê Sûriyê di asta navdewletî de tê dîtin û tevahî



cîhan bi vê şoreşê bandor bûne, tevî vê jî dewletên desthilatdar û hegemonîk li hemberî îradeya gel bêdengin. Herwiha yek ji berpirsên koçberiyê jî civaka navdewletiye, armanca wê guhertineke demografîk e. Dema ku êrîş zêde dibin koçberî jî zêde dibe. Tê xwestin ku dewletên kiwalisyonê û dewletên yekbûyî ji niha û şonde li xwe vegerin, bi riyea diyaloga demokratîk van pirsgirêkan çareser bikin û bingehê wê welatparêziyeke rast hebe. Bi riya qewmitiyê û olperest diyalog bi pêş nakeve.

Dewleta Tirk ya dagirker dixwaze civak û çandê ji hev dûr bixe, bi taybet hin çandan jî qirbike, îrada gelan bê bandor bike û tu sîstemek bi navê demoqratîk li herêmê xwe îfade neke, ji ber îfada gelan tê wateya tunekirin dewletên desthilatdar. Herwiha di hesabê gropa Esîtana de, çend civîn di navber Rûsya, Tirkî, Îran û hikumeta Şamê de çêdibûn, armanca van dewletna çawa ku karibin bi rê û rêbazê siyasî, leşkerî û pilanên qirêj Rêveberiya Xweser têk bibin. Diyare ku armanca dewleta tirk qirkirina gelê kurd e, hikumeta Şamê jî dixwaze veger wekE beriya 2011`an, Îran naxwaze kurd xwedî maf bin, Rûs jî li gor berjewendiyê xwe tev digere. Herêma Dêra zor jî dixwestin dagir bikin û fitnekê di nava êşîre de çêkin. Lê bi hevgirtina gelan plananên wan yên qirêj têk çûn.

## Êrişên wan hêza xweseriyê nîşan dide



**Dilyar Cizîrî**

Ev çend rojin dewleta Tirk a dagirker bê navber êrişên xwe yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomîne. Sivîl, binesazî, navendên xizmetguzariyê, nexweşxane û cihên bi jiyana rojane yên gelê herêmê ve girêdayîne bombebaran û topbaran dike.
Di encama êrişan de bi dehan şêniyên herêmê şehîd bûne, bi dehan jî birîndar bûne, bajarên mezin ku bi milyonan kes tê de jiyan dikin, bê eltrîk û av hatine hiştin.
Ev li gorî peymana Cinêv a mafê mirovan ku dewleta Tirk bi xwe jî imze kiriye, sûcên di nava şer de ye. Heger Neteweyên Yekbûyî û saziyên wê erka xwe pêk bînin, gerek dewleta Tirk û rayedarên wê li dadgeha mafê mirovan a navdewletî werin darizanin.
Lê mixabin, tişta niha dibe ne Neteweyên Yekbûyî, ne Yekîtiya Ewropa û ne jî koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê, ne Rûsiya û hevkarên wê ku hebûna wan bi hêzeke mezin li herêmê heye, dengê xwe ne kirine. Wer xuya dike wê dengê xwe nekin jî, bikin jî wê tenê di asta daxuyanî yan hişyariyên şermok. Dewleta Tirk û Serokê wê Erdogan fêrî şêwazê wan bûne û riya derbaskirina wê bi guhnedana li wan derbas dike.
Ji ber wê jî barê gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê hîn girantir dibe.
Lê carek din jî êrişên wan hêza hevgirtina gelan ku Rêveberiya Xweser û hêza wê ya leşkerî QSD'ê nûnertiya wê dike, nîşan dide. Di van êrişan de û bi taybet rêbazê dewleta Tirk û şêfê wê Erdogan daye destpêkirin, gotina bapîrê min a digot "Dema niştecihên gundekî bi gundekî ne dikarî, bênderên wan ên gund dişewitandin" tîne bîra min.
Tişta Erdogan niha dike jî ew e. Ew dixwaze bi şewata bênderan şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê qûtê jiyanê bihêle. Ev jî lawazî û têkçûna wan nîşan dide. Tişta niha dixuyê niha nikarin ti zirareke cidî bi hêzên me yên leşkerî bînin. Ji ber wê êrişî navendên xizmetguzariyê, sivî û hêzên ewlekariya hindir ku ew jî li gorî itîfaqên fermî bi garantoriya Rûsiya û Amerîka, gerek rastî êrişan neyên.
Balkêşe ev êrişên wan bi salvegera Kompoloya Navdewletî ya 9'ê Cotmehê de ye. Dewleta Tirk a dagirker bi vê jî dixwaze peyamên taybet bide gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên xwe li ser Felsefeya Netewa Demokratîk bi rêxistin kirine. Dewleta Tirk û hêzên erka xwe ya destwerdanê bi karnayînin û di bê dengiya xwe bi israr in, şirîkê komkujiyan e.
Lutkeya van êrişan jî bi têkçûna DAIŞ'ê ya li Baxozê ku di sala 2019'an de pêk hat destpê kir. Wê demê DAIŞ têk çû, êriş kirin. Li Başûrê Kurdistanê jî ji ber nikarîbûn peymana 9'ê Cotmehê pêk bînin, êriş pêk anîn. Niha jî ji ber plana wan a Dêrazorê têk çû û nikarîbûn di navbera kurd û ereban de fitneyê derbixin. Êrişeke berfireh pêk anîn. Bi wateyeke din, ev êrişa dewleta Tirk bi armanca tunekirina Rêveberiya Xweser û bi hêzkirina çeteyên DAIŞ'ê ye. Lê car din jî bela gelê me rehet be, hêza plana DAIŞ'ê li Kobanê têk bir û li Baxozê bi encam kir, wê Planên êrişên Erdogan jî têk bibe û azadiya mezin tacîdar bike.

# Kiryarên dagirkeriya Tirk li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijmirovî ne

**Mihemed Emîn El Neîmî destnîşan kir ku êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê wek sûcên "qirkirina komî" û kiryarên "dermirovî" tên pênasekirin û got: "Divê berpisên tirk li dadgeha cezayan a navneteweyî li gorî qanûnên bingehîn ên Romayê, werin darizandin."**



Parêzer û hiqûqnas Mihemed Emîn El Neîmî destnîşan kir ku sûcên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li dijî hemû pîvan û qanûnên navneteweyî ne.

**Berpirsên rejîma tirk sûcdar in û divê hesab ji wan bê pirsîn**

El Neîmî destnîşan kir ku serokê dewleta Tirk a dagirker Erdogan û serokwezîrên wî û wezîrê parastinê û serokê erkanê sûcdar in ji ber ku ji 2016`an ve, dema Cerablus, Bab û gundên girêdayî wan, piştre 2018`an dema EFrîn û dûre 2019`an Serêkaniyê û Girê Spî dagir kirin, sûcên şer pêk anîn. Li gor qanûnên pergala Romayê ya sala 1998`an, ew sûcên şer in.

**Divê dadgeha navneteweyî zû sûcdaran darizîne**

El Neîmî diyar kir ku sûcên dewleta Tirk a dagirker ên berê û yên niha wek "qirkirina gelan" tên pênasekirin û got: "Dema ku jiyana şêniyan tê astengkirin ev tê wateya ku planek ji bo qirkirina wan hatiye amadekirin, ji ber wê jî divê dadgeha navneteweyî zû sûcdaran darizîne."
El Neîmî wiha lê zêde kir: "Divê dadgerên dadgeha cezayan a navneteweyî, berdevkê wê û serokê dozgeriya giştî zû destwerdanê bikin. Erkên xwe bînin cih. Ji ber ku sûcên ku niha tên kirin, li gor pîvanên qanûna navneteweyî, `qirkirina komî` û `sûcên li dijî mirovahiyê` ne."

**Cezayê îtîrafkirina "jenosîdê" du qat e**

Niêmî wiha domand: "Gefxwarina wezîrê derve yê Tirk Hakan Fîdan û îtîrafkirina bi rûxandina binesazî û stasyonên sereke yên herêmê nîşan dide ku ew ê sûcên dîtir jî pêk bînin. Madem bi cezayê xwe îtîraf kirin ku wek `jenosîdê` tên sinifandin, wê demê cezayê wan du qat e."

**Jiyana şêniyan di xetereyê de ye**

El Neîmî pirsek kir ku çima ev sûc li dijî mirovahiyê ne û di heman demê de bersiv da û got: "Ji ber ku ev sûc di erdîngariyeke fireh de hatiye kirin. Deverên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hatin bombebarankirin. Daxuyaniyên Hakan Fîdan jî destnîşan dikin, kuştin bi zanabûn e. Xistine jiyana niştecihan di xetereyê de, neçarkirina wan ku ji warên xwe koçber bibin tevî topbaran û bombebaranê, tev sûcên li dijî mirovahiyê ne."
Li gor El Neîmî, di van êrişan de niştecih, tên çewisandin û got: "Topbaran, delîl e. Sedemên wê siyasî ne û girêdayî nasnameya gelê li wir e. Ew dixwazin nijad, netewe û çandên li herêmê qir bikin."

**Sûcên cudakirina nijadî**

El Neîmî ev li gotinên xwe zêde kir: "Sûcên din bi dizî tên kirin ku wek sûcên `nijadperestiyê` tên sinifandin. Qanûnên navneteweyî nahêlin mîna van sûcan pêk werin. Şêniyên li wir, tên topbarankirin. Ev sûc dê bi xwe re aloziyan bînin."

**Dubarekirina êrişê bi xwe sûc e**

El Neîmî îşaret pê kir ku êriş ne nû ye û dubare bûye, dubarekirina senaryoya êrişê bi xwe sûc e û got: "Ew ji êrişê dixwazin, armanceke siyasî bi dest bixin û projeyên xwe yên Mîsaqê Millî pêk bînin. Divê NY`yê bi lez destwerdanê bike. Civîneke awarte ya Konseya Ewlehiyê li dar bixe ji ber ku Tirkiye ev sûc kirine."

**Xizmeta vejandina DAIŞ`ê dike**

El Neîmî aşkera kir ku armanca dewleta Tirk a dagirker ji êrişan ew e ku tevliheviyê li herêmê peyda bike û tola çeteyên xwe yên DAIŞ'ê hilîne û wiha anî ziman: "Tirkiye naxwaze şêniyên herêmê parastina girtîgehên DAIŞ`ê bikin, ew ê kêfxweş bibe dema DAIŞ derkevin derve. Ev sûc xizmeta vejandina DAIŞ`ê û Mîsaqê Millî dikin."



# Kongra Star: Komplogeran felsefeya Rêber Apo armanc girtin

Berdevka Kongira Star a Kantona Qamişlo Şaha Xelîl da zanîn ku komplogeran felsefeya Rêbertî armanc girtin. Herwiha got, ji bo komplo û tecrîd bi dawî bibe û heta asta têkoşîna ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo were bilindkirin; divê hemû jin felsefeya Rêber Apo nas bikin.

**Reşo Muhemed/Qamişlo**

10'ê Cotmeha sala 1998'ê ji bo gelê kurd rojeke reş bû. Di vê rojê de gava yekem ya kompiloya bêheqiyê di şexsê Rêber Apo de hat avêtin.
Di sala 1999'an de, di encama Komployeke Navneteweyî de ku gelek hêzên navneteweyî tê de cih girtin, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hat revandin û radestî dewleta Tirk a faşîst hat kirin. Ji destpêka dîlgirtina Rêber Apo û heta niha tecrîdeke giran li ser tê feriz kirin. Ku ev bûye nêzî 30 mehane tu agahî ji Rêber Apo nehatine girtin.
Têkildarî Komploya Navdewletî û tecrîda ku li ser Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan, berdevka Kongira Star a Kantona Qamişlo, Şaha Xelîl ji rojnameya me re axivî.

**'Komplogeran felsefeya Rêber Apo armanc girt'**

Şaha Xelîl da zaîn ku armanca dewleta Tirk a faşist, herwiha hêzên navdewletî ji komploya li ser Rêbertî hat meşandin, dîlgirtina fikr û felsefeya Rêber Apo ye û wiha got:"Em tev dizanin ku sîtstema li ser civaka cîhanê tê meşandin sîstemeke hegemonîk û desthilatdarî ya beht e. Piraniya hêzên navdewletî wiha ne, ew bi riya meşandina vê sîstemê berjewndiyên xwe yên desthilatdariyê pêktînin. Ev sîstem jî civakê ji cewherê wê derdixe û wê dimiçiqîne. Lê fikir û felsefeya Rêber Apo li dijî miçiqandina gelan derdikeve. Felsefe û



fikrên Rêbertî pirojeya Netewa Demokratîk ji hemû gelên cîhanê re. Herwiha yekziman, yeknetew yekol napejirîne . Ev yek jî li dijî sîstema desthilatdar û hêzên hegemonîk e, lewma dewleta Tirk a faşist bi piştgirya hêzên hegemonîk da dîlgirtin. Lê wan nikarîbûn bi komplo û dîlgritinê fikr û felsefeya Rêber Apo dîl bigirin. Rêbertî karîbû di hundrê zindanê de jî xemxurê azadiya gelê xwe bû. Di heman demê de jî fikrê civakê û jinan azad kir. Vaye îro rengê jiyana ku gelên bakur û rojhilatê Sûriyê jiyan dikin nimûneyeke herî nêzîk û serkeftî ye. Dewleta Tirk a Faşist tecrîdeke girankirî dide meşandin û ev zêdetirî 31 mehan e ku Rêber Apo di bin tecrîdeke giran de ye."

**'Rêbertî ji mafê dîlgiran yê rewa jî bê par e'**

Berdevka Kongira Star a Qamişlo diyar kir ku bê mafî li Rêber Apo tê kirin û cîhan tev ji vê yekê sûcdar e û wiha doman: Em dizanin ku mirovê tê dîlgirtin û dikeve zindanê jî xwedî maf e. Ji mafê kesê dîlgirtî ye ku malbata xwe, heval û parêzerê xwe bibîne. Ev maf jî di hemû zagonên dewletên cîhanê de heye. Lê tenê di zagonên faşistiya dewleta Tirkiyê de tune ye. Bi taybet jî ev tecrîda ku di şexsê Rêber Apo de tê meşandin e. Ev bûye demek dirêj ku Rêber Apo têkilî ne bi malbat û parêzer xwe re kirye. Ew di nav çar dîwarên bêheqiyê dijî û em nizanin ku rewşa wî çawa ye. Ev tişta ku dewleta Tirk a dagirker di derheqê Rêbertî de dike karekî dûrî zagonan e. CPT'iya ku dibêje ez mafê mirovan diparêzim bi erkê





xwe li hember tecrîdê ranabe. Ev bêdengya rêxistinên mafên mirovan CPT jî di nav de tê xuyakirin ku hevkarên vê tecrîdê ne."

**'Divê hemû jinên cîhanê bi felsefeya Rêbertî xwe ronî bikin'**

Berdevka Kongira Star a Kantona Qamişlo, Şaha Xelîl destnîşan kir ku ji bo komplo û tecrîd bi dawî bibe û asta têkoşîna ji bo azadiya fîzîkî ya rêber Apo were bilindkirin; divê hemû jin felsefeya Rêber Apo nas bikin û wiha axivî: "Hedefa sereke ya sîstema desthilatdar û baviksalarî miçiqandina jinê ye. Ew azadiya jinan qebûl nake, lê belê wê di warê cinsî û pereyan bi kar tîne. Lê fikr û felsefeya Rêber Apo van bêheqiyên ku di derheqê jinê de tê kirin qebûl nake. Rêbertî dibêje ger di civakê de jin ne azad be ew civak kole ye û ne azad e. Doz û mafdayîna ku rêberê me ji bo me jinan kiriye, di asteke herî bilind de ye. Divê em weke jin li gor wê baweriya ku Rêbertî daye me, derkevin. Em bi ser felsefeya Rêber Apo xebat û têkoşîna ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û azadiya jinê dikin. Nih divê xebata li bakur û rojhiltê Sûriyê û Kurdistanê tenê sînordar nemîne. Herwiha divê hemû jinên cîhanê jî fikrê xwe bi fikr û felsefeya Rêber Apo ronî bikin. Bi vî hawî jî wê asta têkoşîna me jinan ya ji bo têkbirina tecrîd û kompioyê hîn xurtir bibe."

## Gelên Sûriyê neçarin li hemberî êrişên wêrankar li ber xwe bidin



**Zekî Bedran**

Dewleta Tirk êrişên wêranker ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomîne. Bi balefiran tevahî pêwîstiyên jiyana gel a binerd kir armanc. Jixwe wezîrê karê derve bi awayek vekirî ev ji tevahî cîhanê re ragihand. Got, çavkaniyên binerd û enerjiyê armanca me ya rewa ye. Di şeran de armancgirtina çavkaniyên jiyana gel hatiye qedexekirin. Ev cih nakevin nava armancên leşkerî. Dema Rûsyayê li Ukraynayê sivîl û çavkaniyên binerd kirin armanc hertim dihat şermezkirin û sûcdarkirin. Vê weke sûcek ê şer nîşan didin. Di vê mijarê de dadgeha seza ya navnetewî li dijî Pûtîn doz vekir. Niha Pûtîn nikare derkeve derveyî welat.
Tirkiye qada hewayî ya di bin venêrîna DYE û Rûsyayê de bikar tîne û van êrişan didomîne. Di êrişên dawî de tu bertek ji cîhanê nehatin. Beriya niha DYE yê digot ew li dijî êrişane û hwd… Digot bêîstixrariya li herêmê têkoşîna li hemberî DAIŞ'ê nerênî bandor dike. Vê carê ew jî negot. Aliyê Tirk zextê li DYE yê dike ku têkiliyên xwe yên bi YPG'ê re qut bike. DYE dîsa bêdeng ma. Wisa xuyaye ku bi hikumeta Tirk re bazarên veşartî dike. Dewleta Tirk îdea dike ku herdû gerîllayên çalakiya li Enqerê pêk anîne ji sînorê Sûriyê çûne Tirkiyê û hewl dide vê ji bo êrişên xwe yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke hêncet bikar bîne. Ma dikare bi hincetek wiha jiyana bi milyonan mirovî bike xeteriyê û êrişek ku tevahî çavkaniyên jiyanê ji holê radike pêk bîne? Bêguman ev ne aqilane ye û ne cihê baweriyê ye. Hêzên li Rojava tiştekî bikin an jî nekin, dê teqez dewleta Tirk êriş bike. Tu nirxê hincet avakirinê tune ye. Yên dewleta Tirk rêve dibin ev bi salane dibêjin ku ew li Sûriyê statûya Kurdan napejirînin. Ji bo vê daxuyanî dan û gotin em ê korîdora Kurdan ji holê rakin. Gotin ku dê ji Efrînê hetanî Dêrikê bi kûrahiya 30 km bixin bin venêrîna xwe. Erdogan ev cih li ser nexşeyê di lijneya giştî ya NY de ji cîhanê re ragihand. Tiştên ku niha tên kirin pêkanîna vê plan û stratejiyê ye.
Cihê ku hêzên dagirker ên Tirk dikevinê ji Kurdan re derfetê jiyanê namîne. Gel ji axa xwe tê derxistin, ên ji derve tên datînin cihê gelê herêmê. Li hemberî Kurdan tunekirina nîjadî tê kirin. Tevahî malên gel tên talankirin, hebûna wan tê desteserkirin. Niha jî dewleta Tirk çavkaniyên jiyanê ziwa dike û dixwaze vê tunekirina nîjadî li tevahî Rojava belav bike. Depoyên petrol û gazê, cihên hilberîn û genim tên bombekirin. Dixwazin van planên xwe yên wêranker û qirker di bin navê têkoşîna li dijî terorê de perde bikin.
Dewleta Tirk pirsgirêka sed salî ya Kurdan xistiye nava têgîna terorê. Beriya niha DYE û welatên Ewropayê PKK xistiye lîsteya terorê û dewleta Tirk jî vê weke kaxezeke vekirî ji bo planên xwe yên qirkirinê bikar tîne. Tam bi tolaztiya şerqê dibêje madem we PKK xistiye lîsteya terorê wê demê hûnê YPG'ê jî bixin lîsteya terorê. Jİ ber vê jî her tim dibêje PKK û YPGê' heman in. Yanî dema PKK û YPG heman bin, madem dixwazin PKK'ê bi tevahî tune bikin, wê demê çi ji PKK'ê bikin divê heman tiştî li YPG'ê jî bikin. Yanî pêwîst nake ku YPG û hêzên Sûriyê tiştekî bikin. Ev hêz di her mercê de pêwîste bêne tunekirin. Ji bo vê jî zextê li DYE yê dikin ku ji Sûriyê derkeve yan jî têkiliyên xwe yên bi YPG'ê re qut bike. DYE yê bi hevkariya bi PKK'ê û rêxistinên terorê re sûcdar dikin.
Em di salvegera 25'emîn a kompioya 9'ê Cotmehê de ne. Rêber Apo bi kompioyek ku bi pêşengiya DYE yê pêk hat, dane Tirkiyê. Bi vî awayî pergala Îmralî ya tecrîd û îmhayê ava bû. DYE û NATO'yê hetanî niha piştgiriya tevahî komkujî û sûcên li dijî Kurdan kirin. Eger piştgiriya van hêzan nebûya Tirkiyê nedikarî evqas sal vî şerî bidomîne. Di 9'ê Cotmeha 2019'an de dîsa dewleta Tirk bi piştgiriya DYE'yê Serêkaniyê dagir kir. Dewleta Tirk duyemîn artêşa NATO'yê bikar tîne û qirkirina Kurdan didomîne û bûye belaya serê gelên herêmê.
Êrişên bi 4'ê Cotmehê re destpêkirine, dê tevahî jiyana gelê Sûriyê zehmet bike. Bandorên wê yên wêranker tenê bi Bakur û Rojhilatê Sûriyê re sînordar namînin. Ji derveyî wê bila kes nefikirine ku ev êriş rawestiyan an jî dê careke din çênebin. Tirkiye, çi bibe bila bibe dê tevahî xirabiyên xwe ji bo jiholêrakirina vebijêrka rêveberiya xweser a demokratîk plan bike û bikar bîne.
Herêmên hatine bombekirin wekî ku ne axa Sûriyê ye, tu bertek ji rêveberiya Şamê nehat. Dibe ku hêza wî ya şerkirinê nebe. Êriş li tevahî axa Sûriyê, li cihên leşkerên artêşa Sûriyê lê hene jî çêdibin. Gelê Kurd, Tirk, Ereb, Asûrî tevahî bi hev re li van herêman dijîn. Ev hemwelatiyên Sûriyê ne. Ma pêwîst nedikir ku hikumeta Şamê bi awayek fermî serlêdana NY bike û bibe xwedî bertek?
Me ji ragihandinê bihîst ku Hemasê di 7'ê mehê de êrişî Îsraîlê kir. Bûyer bi lez kete rojeva cîhanê. Bi dehsalane pirsgirêka Filîstînê di rojevê de ye û ji bo çareseriyek adil nayê dîtin her tim di rewşa alozî û pevçûnê de ye. Tevahî herêmê bandor dike. Pirsgirêka Kurd jî wiha ye. Eger bixwazin li Rojhilata Navîn aştî û îstixrarê pêk bînin, divê pirsgirêka Kurd û Fîlîstînê bi awayek adilane çareser bikin. Yan jî weke ku Erdogan dibêje pirsgirêka gelan bi hêzê û tundiya dewletê çareser nabe. Teqez dê di nava gel de nîvendên cuda yên berxwedanê û alternatîf derbikevin.

## Li dijî kompioyê berxwedana Rêber Apo



**Farûk Sakik**

Di destpêka salên 90'î de Amerîkayê dixwest ku Rojhilata Navîn heta Asya Navîn ji nû de dîzayin bike. Dixwestin wan dewlet û rêxistinên ku li herêmê bi hêz in, bê bandor bikin. Di nava van hêzan de PKK û rêberê wê Abdullah Ocalan jî; ji bo berjewendiyên xwe yên li Rojhilata Navîn wekî talûkeya herî mezin didîtin.
Dema ku di 15'ê Sibatê de Rêber Apo radestî Tirkiyê kirin, digotin wê PKK ji holê rabe. Dîroka Kurdan dihat berçavê wan. Digotin di hemû serhildanan de civaka Kurd li pey rêberê xwe neçûne. Bi dîl girtina wan serhildan jî bi dawî bûne. Dema Şêx Saîd û Seyîd Riza hatin girtin, yek kes li wan xwedî derneket.
Lê ev car wisa nebû Abdullah Ocalan cûda bû.
Rêber Apo rêberek herêmek an jî eşîretek nebû. Dema ku dîl hatibû girtin ruhê netewî bi Kurdan re peyda kirbû. Li pey xwe rêxistinek hiştibû. Herkes li wî xwedî derdiketin.
Dema dîl hat girtin êdî bi taktîk û stratejiyên modern midaxleyî pêvajoyê kir û destûr neda ku rêxistina wî tasfiye bibe.
Belê Rêber Apo yê ku ji gelek ne xwedî dewlet û statu ye re rêbertî dikir, ev yek çawa pêk anî. Di şertên tecrîdê yên girankirî de çawa dibû midaxleyî geşadanên derve dikir? Tecrûbeyên wî yên 20 salên li Rojhilatê Navîn hebûn. Her wek wî digot li pişta şûrek siyaset dimeşand.
Dema ku dîl hat girtin, xwendina xwe ya zanistî domand. Digot, mejiyê me divê hertim wek avek biherike. Bi giranî dîrok û felsefe ji dema antîk girtibû hetanî roja me anîbû. Di nivîsek xwe de digot, dinya niha di nav destê min de ye. Ji bo ku raboriya zanistî û ya serdemê bi hev re analîz dikir. Ji ber van zanyariyên wî baş dizanibû ku kîjan dewlet wê sibê hemleyek çawa pêk bîne. Dizanibû bi vê stratejî û taktîkî ev hêz wê sibê çi bike. Bi rûhek herikbar tevdigeriya û dijiya.
Di sala 2007'an de wî bihara gelan a ku nêzîk dibû dîtibû û hişyarî dida Kurd ji bo wê serdemê amadekariyên xwe bikin. Hêzên xwe yên eskerî û dîplomasiya xwe bikin yek.
Mînaka herî mezin: Parêzerên wî digotin dema şerê Sûriyêî dest pê kir, got wê rejîma Şamê neyê guhertin. Lê êdî hêza wî ya berê wê tunebe. Di zîhniyeta wan a demokrasiyê de hîç guhertin çênabe. Ev mixalefeta li dijî rejimê şer dikin, wê negihîjin hedefa xwe. Ji bo wê divê Kurd wek xeta sêyemîn tevbigerin.
Îroj êrişên dewleta Tirk a dagirker bê navber dewam dikin. Heger îroj Rêber Apo bikaribûya midaxle bikira rêyek çareseriyê wê bidîta. Herkes di sohbetên xwe de di demên wiha de dibêjin heger Rêber Apo îroj azadbûya wê hemleyên dijmin ji pêş de bidîta û midaxle bikira.
Ji bo vê yekê divê êdî Rêber Apo fizikî azad be. Têkoşînek bê navber were dayîn. Têkoşîna herî mezin fehmkirin û nasandina Rêber Apo ye. Kesên Rêber Apo baş nas bike, wê ji bo azadiya wî bikeve nav liv û tevgerê. Wê têkoşîna azadiya Rêber Apo ji xwe re weke erkek bibîne. Hemleya di 10'ê Cotmehê de dest pêdike divê bê navber dewam bike da ku encam were girtin.